# JI DOLMEBAXÇEYÊ HETA ROJA ÎRO PÊVAJOYA ÇARESERIYÊ:
## TÊGIHÎŞTINA SERNEKEFTINÊ Û PEYDAKIRINA RÊYEKE NÛ

**Cuma ÇİÇEK & Vahap COŞKUN**

**01 AVRÊL 2016 - ENQERE**

**Barış Vakfı**
Waqfa Aşitiyê | Peace Foundation

Ev pirtûkçe, bê ucret e; bo firotinê nîn e.

Cuma ÇİÇEK & Vahap Coşkun
**Ji Dolmebaxçeyê heta Roja Îro Pêvajoya Çareseriyê: Têgıhîştina Sernekeftinê Û Peydakirina Rêyeke Nû**

Raporta Polîtîkayê – 1
**ISBN:** 978-605-83546-0-9
Avrêl 2016, İstanbul

Berdan Matbaacılık
Davutpaşa Cad. Güven Sanayi Sitesi C Blok
No: 239 - Topkapı / İSTANBUL
+90 (212) 613 1211
Sertifika No: 12491

**Barış Vakfı**
Waqfa Aşitiyê | Peace Foundation

© Barış Vakfı
© Barış Vakfı Yayınları

Kalyoncu Kulluğu Mah.
Ömer Hayyam Cad. Aydın Apt. No. 40 Kat:1 D: 5 34435
Beyoğlu / İSTANBUL

Tel: +90 212 249 26 54
Faks: +90 212 249 26 54
Web: www.barisvakfi.org
E-Posta: info@barisvakfi.org
Facebook: /barisvakfi
Twitter: /barisvakfi

**PÊŞGOTIN**

Me xwest em bi we re yekemîn xebata Weqfê parve bikin. Piştî ezmûna Meclîsa Aşitiyê ya Tirkiyeyê ku di 1'ê Îlona 2007'an de hatibû damezirandin, ji bo siberojeke wekhev û azad û demokratîk Weqfa Aşitiyê hate damezirandin. Em dixwazin xebatên Meclîsa Aşitiyê sazgehî û dayimî bikin; her wiha em dixwazin van xebatan derbas û zengîntir bikin. Em ê vê yekê bi piştgirî û tevkarî û hewla hevpar a wan dostên xwe yên hêja bikin ku ji aşitiyê bawer dikin.

Ev raport jî berhema kedeke bi vî rengî ye. Berî niha bi salekê, raporta bi navê “Îhtîmal û Derfet di Rêya Çareseriyê de û Nirxandinek li ser Kêşeyan” ji aliyê çar akademîsiyenên hêja û rojnamegerekî ve hate weşandin. Raportê ew serdema vedihewand ku heta hilbijartina 7 Hezîranê bû. Ev raporta li ber destê we ya bi navê “Ji Dolmebaxçeyê Heta Roja Îro Pêvajoya Çareseriyê: Têgihîştina ji Sernekeftinê û Peydakirina Rêyeke Dîtir”, bi awayekî berdewamiya raporta yekem e û piştî 7'ê Hezîranên vedihewîne.

Her wekî ji navê wan diyar e, her du raport du serdemên jêk-ciyawaz li xwe vedigirin; ev raport piralîtiya pêwîstî û dayimîbûna xebatên aşitiyê dixe rû.

Sedema hebûna Weqfa Aşitiyê ew e ku di her şert û mercekê de tevkariyê bike da ji bo ku her cure kêşe bi rêya diyalog û guftûgoyan bêne çareserkirin. Di wan serdeman de ku bilêvkirina aşitiyê jî dijwar e, israrkirin di van mijaran de, wateyeke din bi xwe ve digire.

Her wekî wan hûrgiliyên ku di raportê de hatine aşkerakirin, Tirkiye, di qonaxeke wiha dijwar re derbas dibe. Em vê qonaxê bi yekdestî dikarin derbas bikin, nek bi alîgiriya korkorane. Eger em bes li pey rastî û duristî û ya xweşik biçin, avakirina aşitiyê, wekî ku xuya dike, ne zehmet e; ev raport, vê yekê ji me re vedibêje. Pêşniyaran raber dike ji bo ku îradeya siyasî ya aşitiyê şêwe bigire. Dibêje ku rêya çareseriyê, bi avakirina zimanê aşitiyê dikare mumkun be.

Ezmûna wan welatan, ku bi wêrekiyeke rexnegirane û xwe-rexnegirane nêzî van cure kêşeyan bûne, derxistiye ku çareseriya van cure kêşeyan bêmaliyettir dibe li şûna ku dike mirin û pevçûn û cemserbendî çêbibin. Armanca vê xebatê ew e ku tevkariyê li vê yekê bike.

Em careke din ji ber vê xebata wan sipasiya Cûma ÇÎÇEK û Vahap COŞKÛN dikin ku ji wan Cûma ÇÎÇEK hem mamosteyê Zankoya Artûklûyê û hem jî damezirînerê Weqfa me ye û her wiha Vahap COŞKÛN ku mamosteyê Zankoya Dîcleyê ye. Di demeke kurt de karekî baş bi ser xistin.

Ev xebat bi pêşniyar û tevkariya we dê zengîntir bibe.

Seroka Giştî ya Weqfa Aşitiyê
Ayşe Soysal

**Cuma ÇİÇEK**

Lîsans û lîsansa xwe ya bilind li Zankoya Îstanbul Teknîkî ya Stenbolêê kir. Perwerdeya xwe ya doktorayê li Sciences Po de Parisê, di Zanista Siyasetê de, di bernameya Ccivaknasiya Ssiyasetê û Ppolîtîkayên Cemawerî giştî ya zanista siyasetê de bi dawî kir. Ji 2014'an ve ye li Zankoya Artûkliyê ya Mêrdînê, li Fakulteya peymangeha Zzanistên Îiqtîsadî û Îîdarî, di Bbeşa Zzanista Ssiyasî etê û Ppeywendiyên Nnavneteweyî de wek asistan-profesor (yan jî doçêntê alikar) dixebite. Çîçekê ku endamê Enstîtuya Lêgerînên Siyasî û Civakî û Siyasî ya Amedê ye, yek ji damezirînerên Weqfa Aşitiyê ye.

Di kovarên wekî *Birikim, Praksis, İktisat Dergisi, Turkish Studies, Dialectical Antropology* de li ser kêşeya kurd, xweseriya demokratîk, îslamgeriya kurd, birêveberiyên herêmî, peywendiyên çînî û nasnameyî, newekheviyên herêmî û pêvajoya aşitiyê gotarên wî hatine weşandin. Di weşana înternetî ya kovara Birikimê de (www.birikimdergisi.com) bi rêk û pêkî dinivîse. Sê pirtûkên weşandî yên Çiçek hene: *Ulus, Din, Sınıf: Türkiye'de Kürt Mutabakatının İnşası* [Netewe, Dîn, Çîn: Mitabeqetsaziya Kurd li Tirkiyeyê] (İletişim, 2015); *Zimanek çima tê qedexekirin?: Polîtîkayên zimanî û rewşa kurdî li Tirkiyeyê* (Peywend, 2013); *Küreselleşme ve Yerel Demokrasi: Liberal Katılım Söyleminin Sınırları & Diyarbakır Örneği* [Globalîzm û Demokrasiya Xwecihî: Sînorên Gotara Beşdariya Lîberal & Wek Nimûne Amed] (Vate, 2011).

**Vahap COŞKÛN**

Lîsans û lîsansa xwe ya bilind li Zankoya Dîcleyê kir. Xebatên xwe yên doktorayê li Zankoya Enqereyê bire dawî. Gelek gotarên wî yên li ser mafên mirovan, teoriya siyasetê û kêşeya kurd di kovar û rojnameyên curbecur de hatin weşandin. Niha li Peymangeha Huqûqê ya Zankoya Dîcleyê dixebite; her wiha qunciknivîs e di rojnameya Yeni Yüzyılê [Sedsala Nû] de.

Pirtûkên weşandî yên Coşkûnî ev in: *İnsan Hakları: Liberal Bir Tahlil* [Mafên Mirovan: Tehlîleke Lîberal] (Weşanên Liberte, 2007), *Ulus-Devletin Dönüşümü ve Meşruluk Sorunu* [Veguherana Netewe-Dewletan û Kêşeya Rewatiyê] (Weşanên Liberte, 2008), *Toplumsal Barışın İnşası: Sivil Anayasa Arayışı* [Avakirina Aştiya Civakî: Li pey Makezagoneke Sîvîl] (Weşanên Baroya Amedê û Komeleya HeinrichBöllStiftung, 2009), *Dil Yarası* [Birîna Zimanî] (Weşanên DİSA, 2010; li gel Şerîf Derînce û Nesrin Uçarlar), *İnsan Hakları ve Demokrasi* [Mafên Mirovan û Demokrasî] (Weşanên Zankoya Anadoluyê, 2012; Xebateke Kolêktif), *Kürt Meselesinin Anayasal Boyutu* [Rehenda Makezagonî ya Kêşeya Kurd] (Weşanên Orion, 2013).

**Gîrîzgeh** ........................................ 6

**Bibîranîna Deklarasyona Newroza 2013'an** ........................................ 7

**Dolmebaxçe: Derîzanga Ku Nekarî Bê Derbaskirin an jî Dawiya Qonaxa Hevnaskirinê** ........................................ 9

**Pevçûnên Ku Gurtir Vegeriyan: Pevçûnên Nav-Bajaran û Bandorên Wan ên Sosyopolîtîk** ........................................ 11
*Kuştî û Wêrankariyên Civakî* ........................................ 11
*Encamên sosyopolîtîk ên pevçûnên nav-bajaran* ........................................ 13

**Pêvajoya Çareseriya 2013-2015'an Çima Tûşî Sernekeftinê Bû?** ........ 15
*Bikaranîna Demê* ........................................ 15
*Xumamiya zêde* ........................................ 16
*Pabendnebûn li teehudan* ........................................ 18
*Avakariya Pêvajoya Çareseriyê* ........................................ 19

**Rêya Bêserkeftî** ........................................ 20
*Binbesta PKKê* ........................................ 20
*Binbesta Dewletê* ........................................ 21

**Encam û Pêşniyar bo Polîtîkayê** ........................................ 23
*Bêpevçûnî û paqijkirina bajaran ji çekan* ........................................ 24
*Veavakirina civakî li qadên pevçûnan* ........................................ 24
*Pêkanîna zemînekî bo pêvajoya guftûgoyeke nû* ........................................ 25
*Pêvajoya guftûgoyeke nû, mekanîzm û ektorên wê* ........................................ 26

**Pêvek 01 Ji Dolmebaxçeyê heta Îro: Çi Qewimî?** ........................................ 30

**Gîrîzgeh:**

> *“Ew sedhezar û mîlyonan kes ku bi agirê Newrozê dilê wan pêketiye û qad heta dawiyê tijî kirine; êdî aşitiyê dixwazin, biratiyê dixwazin, çareseriyê dixwazin.*
>
> *Îro em êdî çavên xwe ji bo Tirkiyeyek nû û Rojhilata Navîneke nû û siberojeke nû vedikin. Ew ciwanên ku bangewaziya min dane ser dilê xwe, ew jinên mezin ku peyama min xistine nav dilê xwe, ew dostên ku gotinên min bi gotina ser-çavan qebûl dikin, ew mirovên ku bi dîqet guh li min girtine;*
>
> *Îro serdemeke nû dest pê dike. Dergehek vedibe li ber têkoşîna berxwedana çekdarî ber bi ji bo pêvajoya siyaseta demokratîk. Êdî bila çek huş bin, bila fikr û siyaset biaxivin. Ev; ne dawiyek e, destpêkeke nû ye. Ev; ne destberdan e ji têkoşînê, dan-destpêkirina têkoşîneke ciyawaz e. Zemînê nû yê têkoşînê, fikr û îdeolojî û siyaseta demokratîk e; dan-destpêkirina hengaveke demokratîk ya nû ye”*

Ev rêzên li jor; ji bangewaziya rêberê PKK’ê Ocelan in di Newroza 2013’an de.

Ocelan ev bangewazî, piştî wê pevçûna bi maweya 30 salî, bi pesend û agahiya dewletê, li navendeke sembolîk wekî Amedê, di rojeke sembolîk de, li hember nêzîkî mîlyonek mirovî kir ku ev pevçûn bûye sedema wêrankariyên mirovî, aborî, civakî û mekanî. Dema ku me ev bangewaziya dîrokî bi bîr anî, divê em wek civak, bi rêxistinên sîvîl û çapemenî û akademî û dezgehên siyasî, wê yekê qebûl bikin ku me nekarî ku em vê derfeta mezin binirxînin.

Pir ne, hê berî niha bi salekê, em li ser wan yekan diaxivîn ku PKK hêzên xwe yên çekdar vekişîne derveyî sînoran û li Tirkiyeyê bi temamî dest ji çekan bikişîne û kêşeya kurd bi rêyên demokratîk û aşitiyane bê çareserkirin. Armanca wê Pêvajoya Çareseriyê, ku piştî bangewaziya Newroza 2013’an dest pê kir, ew bû ku peywendiyên Tirkiyeyê li gel kurdan, li derveyî sînorên Tirkiyeyê di çarçoveyeke herêmî de, ji nû ve saz bike. Îro em ji aliyekî ve rû bi rûyî wan pevçûnan in ku belavî nav bajaran bûne û ji aliyê din ve jî em rû bi rûyî wê pevçûna nû ne ku di ser PYD/YPG’ê re derketiye derveyî sînorên Tirkiyeyê.

Di vê raportê de, raweste li ser wê Pêvajoya Çareseriyê hatiye kirin ku hêvîyeke mezin afirandibû di mijarên wekî bêçekbûna PKK’ê û çareseriya aşitiyane ya kêşeya kurd û demokratîkbûneke berfireh de. Li ser vê peywendê, armanca wê ew e ku tevkariyê bike li vedestpêkirina wê pêvajoya ku tûşî qutbûnê

bûye; her wiha dixwaze ji nû ve diyalog û gotinê anku siyasetê di kêşeya kurd de hakim bike ku ketiye cogeheke pevçûnawî.

Fokusa raporê li ser wê pêvajoya ye ku ji beyannameya çapemeniyê ya hevpar ya nûnerên HDP'yî û hukumetê li Koşka Dolmebaxçeyê û bi vir ve hatiye pê. Li ser wê sernekeftinê bi hûrî disekine û ji bo ku biratî û aşitî saz bibe, di serî de ji bo siyasiyan û ji bo hemû ektoran pêşniyara polîtîkayan dike.

Ji ber vê yekê, destpêkê, raweste li ser wê bangewaziya Newroza 2013'an hatiye kirin ku pêvajo –bi taybetî wek sembolîk- hingî dest pê kiribû. Di beşa duyem de, Beyannameya Dolmebaxçeyê wek derîzangekê tê nîqaşkirin ku nekariye jê bê derbaskirin. Di beşa sêyem de, li ser bandorên sosyopolîtîk û bîlançoya wan pevçûnan hatiye rawestandin ku di navbera Ttîrmeha 2015 û Aadara 2016'an de pêk hatine. Di beşa çarem de, nîqaşa wê yekê tê kirin bê ka Pêvajoya Çareseriyê ya 2013-2015'an çima bi sernekeftî bi dawî hat. Di beşa pêncem de, tetqîqa wê yekê dike bê ka çima ev pevçûnên dawî rêyek e ku serkeftiyê wê tune ye. Di beşa dawîn de, li ber ronakiya wan tecrûbeyên jiyankirî, pêşniyara hin polîtîkayan dike ji bo ku rêyeke nû bê peydakirin. Her wiha di wê kronolojiyê de ku li raportê hatiye zêdekirin, ew bûyerên diyar û sereke tên bibîrxistin ku ji civîna Dolmebaxçeyê heta îro rû dane.

## Bibîranîna Deklarasyona Newroza 2013'an

Pêvajoya Çareseriyê, wek sembolîk, di 21'ê Adara 2013'an de dest pê kir. Bangewaziya Ocelan[1] li qada Newrozê ya Amedê, li hemberî sedhezaran û di TV'yên sereke de bi zindî ji hemû Tirkiyeyê re hate ragihandin. Bi rastî, bi zindî ragihandina bangewaziya rêberê PKK'ê ji mîlyonan re, di roj û cihekî wiha girîng de, ji bo civaka Tirkiyeyê dihate wateya rojeke dîrokî ku piştî wan pevçûnan hatibû ku ji 1984'an ve bûne sedema wêrankariyên mirovî û sosyoekonomîk û cihî. Piştî serdemeke dirêj, ji bo çareserbûna kêşeya kurd bi siyasetê û dûr ji çekan, hêviyeke mezin derhatibû.

Bi qasî şêwaza ragihandina bangewaziyê, naveroka wê jî balkêş bû. Ocelan radigihand ku serdemeke nû *"ji qonaxa berxwedana çekî bo qonaxeke siyaseta demokaratîk, dergehek"* vebûye. Li gorî vê, "zemînê têkoşîna nû; fikr, îdeolojî û siyaseta demokratîk e û dixwaze hengaveke mezin a demokratîk bide destpêkirin." Ocelanê ku cext li ser daxwaziyên mîlyonan ên wekî aşitî û biratî û çareseriyê kir, mizgîniya *"Tirkiyeyeke nû, Rojhilateke Navîn a nû*

**1** "Öcalan'ın Açıklaması: 'Silahlı Güçler Sınırdışına, Artık Siyaset Dönemi'," *Bianet*, 21 Mart 2013, http://bianet.org/bianet/siyaset/145269-silahli-gucler-sinirdisina-artik-siyaset-donemi, Erişim tarihi: 19 Şubat 2016.

*û siberojeke nû”* dida. Mixatebê cidîtirîn ê bangewaziyê, bêguman, hêzên çekdar ên PKK'ê bûn: *“Em hatine qonaxekê ku wexta wê yekê hatiye ji bo ku ûnsirên me yên çekdar derkevin derveyî sînor.”*

Ocelan; bi qasî wê rêbaza ku di serdema nû de dê ji bo xwe esas bigirin, armancên xwe yên siyasî jî ji nû ve formîle dikirin. Ya rasttir, gotar(dîskûrs) a xwe ya ku di 1990'î de ji bo xwe esas digirtin û di sala 1999'an de bi derdestkirina wî rengekî fermî bi xwe ve girtibû, gihande naverokeke balkêş: Li gorî Ocelan, *“pêkanîna erdnîgariyên takyek-neteweyî û yek-etnîk, înkara esl û cewhera me ye ku îmalateke dermirov e ku armanca modernîteyê ye”. Ji ber vê yekê, “bi wî awayî ku şayanî dîroka Kurdistan û Anadoluyê be, ji bo pêkhatina nîştimanekî wekhev, azad û demokratîk ê hemû gel û çandan, berpirsiyariyeke mezin dikeve stûyê her kesî”.*

Ocelan, di Deklarasyona Newrozê de, bi qasî kurdan bangî komên dîtir ên etnîk/neteweyî jî dikir û ew vedixwendin ji bo ku beşdarî bin di avakirina Tirkiyeyeke nû bin: de: *“Bi boneya Newrozê, herî kêm bi qasî Kkurdan ez Eermen û Ttirkmen û Aasûr û E ereb û gelên dîtir jî vedixwînim ji bo dîtina tîrêjên wan ên azadî û wekheviya wan a heq ku çavkaniya xwe ji vî agirê dadayî werdigirin.”*

Yek ji xalên herî gerîng ên deklarasyonê, bangewaziya Ocelan bû li gelê tirk. Ocelan amaje dida wê pêkvejiyanê ku xwe dispêre huqûqa hevgirtin û biratiyê ya Kkurd û Ttirkan ku nêzîkî hezar salî ye di bin *“ala îslamê”* de pêk hatiye û kurd û tirk wek *“du hêzên bingehîn ên stratejîk ên Rojhilata Navîn”* vedixwendin bo tifaq û pêkvebûn û hevhembêzkirin û jevhelalbûnê.

Dema ku Deklarasyona Newrozê wek temamiyekê bê tetqîqkirin, ew peyamên ku derdikevin pêş, di bin çend sernavan de dikarine bêne komkirin:

- Pêvajoya Çareseriyê, di asta Rojhilata Navîn de, wek parçeyek ji wê tertîba nû dihate hesibandin ku ji sînorên Tirkiyeyê derbas dibe.
- Li ser derketina kêşeya kurd, amaje bi mudaxeleyên derekî û rejîmên zextkar û rola negatîf a elîtan dihate dayîn.
- Li têkoşîna raborî xwedî dihate derketin û cext li ser destkeftan dihate kirin; bes ew yek dihate destnîşankirin ku şert û mercên nû têkoşîneke ciyawaz ferz dikin.
- Tirkiye rûpeleke nû vedike; di vê rûpelê de, malavayî ji çekan dihate kirin û bi wateyeke şênber çekdarên PKKê derdiketin derveyî sînoran.
- Rêbaza serdema nû, wek siyaseta demokratîk dihate pejirandin.
- Bangewazî dihate kirin ji bo redkirina “netewe-dewletokan” û avakirina pergaleke nû li ser plûralîzma etnîk/neteweyî.

- Bi amajeya “yekîtiya îslamî” cext li ser peywendiyên dîrokî yên Ttirk û Kkurdan dihate kirin
- Wek du hêzên bingehîn ên stratejîk, behsa wan pêwîstiyan dihate kirin ku avakirina tifaq û jevhelalbûna Ttirk û Kurdan bûn.

## Dolmebaxçe: Derîzanga Ku Nekarî Bê Derbaskirin an jî Dawiya Qonaxa Hevnaskirinê

Piştî du salên bidiyalog Pêvajoya Çareseriyê, bi ragihandina Deklarasyona Newroza 2013’an, hate qonaxeke girîng: Beyannameya Dolmebaxçeyê. Di 28’ê Ssibata 20105’an de aliyên Pêvajoya Çareseriyê, li Nivîsgeha Serokwezîr a li Dolmebaxçeyê, cara yekem li hember kamerayan daxuyaniyeke hevpar dan. çêkirin. Van kesan nûnertiya hukumetê dikir: Alîkarê Serokwezîr Yalçin Akdoxan, Wezîrê Karên Navxweyî Efkan Ala, Birîkarê Serokê Koma AKPê Mahir Ûnsal û Misteşarê Pergala Giştî û Ewlehiyê Muhammed Dervîşoxlu. Li aliyê din ê maseyê jî endamên Lijneya Îmraliyê yên HDPê Sirri Sûreyya Onder, Îdrîs Balûken û Pervîn Buldan rûdiniştin.[2]

Sirri Sûreyya Onder ê ku li ser navê Lijneya Îmraliyê deqa nivîskî xwend, li ser kêşeya kurd *“çareserî û neçareserî tenê ne eleqedar e li gel me, di heman demê de naveroka wê ya ku bandora wê li ser hemû herêmê heye”* binxêz kir û got ku pêvajoya diyalogê gihîştiye qonanxeke *“fermî û cidî û berpirsiyar”*. Onder destnîşan kir ku em “di xebatên pêvajoya çareseriyê de li ber derazînga biryareke dîrokî ne” û bi van gotinan “tayîna bingehîn a Ocelan li ser qonaxa ku hatiye pê” derbirî:

*“Di vê demê de ku pêvajoya pevçûnên 30 salî ber bi aşitiyeke mayinde diçin, armanca me ya bingehîn ev ku em bigihîjin gihîştin e bi çareseriyeke demokratîk. Ji bo wergirtina biryara dîrokî û stratejîk bo prensîbên ku her kes qebûl dike; li ser bingeha devjêberdana têkoşîna çekdarî, ezem PKK’ê di mehên biharê de vedixwînin bo kongreyeke awarte.”*

*Ev vexwendin, beyana niyeteke dîrokî ye ji bo bicihkirina siyasetê ye li dewsa têkoşîna çekdarî. Sernavên me ev in ku dê hem xala bingehîn a demokrasiyeke rasteqîne û hem jî aşitiya me ya mezin pêk bînin:*

1. *Pênaseya siyaseta demokratîk û naveroka wê*
2. *Pênaseya rehendên xwecihî û neteweyî yên çareseriya demokratîk*
3. *Desteberiyên qanûnî û demokratîk ên hemwelatîtiya azad*
4. *Peywendiya siyaseta demokratîk li gel dewlet û civakê û sernavên li ser*

---

**2** “Ortak açıklamanın tam metni,” *AljazeeraTurk*, 28 Şubat 2015, http://www.aljazeera.com.tr/haber/ortak-aciklamanin-tam-metni, Erişim tarihi: 21 Şubat 2016.

*bisazgehîbûna vê yekê*

5. *Rehendên sosyoekonomîk ên pêvajoya çareseriyê*
6. *Di pêvajoya çareseriyan de peywendiya demokrasî û ewlehiyê divê bi wî awayî be ku bikare azadî û pergala giştî biparêze*
7. *Desteberî û çareseriyên qanûnî yên kêşeyên jin, çand û ekolojîk*
8. *Pêşxistina têgihîştineke plûral û demokratîk li ser pênase û naskirina çemka nasnameyî*
9. *Pênasekirina komara demokratîk, welatê hevpar û miletê demokratîk bi pîvanên demokratîk û di nava pergala demokratîk û plûral de, parastina wan bi desteberiyên qanûnî û neqanûnî*
10. *Danîna makezagonekê bi wê armancê ku bikare van hemû hengav û veguherînan bihezimîne*

*Ji bo pêkanîna wan geşedanan ku di van hemû mijaran de tên payîn, bêpevçûniyeke tehkîmkirî gelek pêwîst e."*

Yalçin Akdoxan, wekî Onder, li ser esasa deqa nivîskî teyîta "qonaxeke nû di pêvajoya çareseriyê de" daxuyand. Akdoxan digot ku em bi serokatiya serokwezîr gihîştine vê qonaxa pêvajoya çareseriyê û bi hemû rehendên wê ve bi awayekî berfireh em li ser disekinin; her wiha Akdoxan ev yek derbirî û got ku em *"lezandina xebatan ji bo danîna çekan û bi temamî bicihkirina bêçalakîtiyê û wek rêbazekê pêşxistina siyaseta demokratîk, girîng dibînin."*

Akdoxan, ku digot di 12 saliya desthilatdariya AKP'ê de reform hatine çêkirin ku wek "şoreşa bêdeng" bûn, wek cihê çareserkirina kêşeyê amaje da sazgeha siyasetê. Li gorî nûnerên hukumetê,

*"demokrasiya me gihîştiye wê karîn û derfetê ku bikare li ser kêşeyan biaxive, nîqaş bike û çareser bike. Ew yek jî zelal e ji bo ku demokrasiya me bigihîje xaleke pêşvetir, divê hemû beşên civakê û partiyên siyasî û saziyên civaka demokratîk bi yekdestî xîret bikin. Bêkarîgerbûna çekan dê lezê bide pêşveçûna demokratîk. Hin sernavên mijaran, ev gelek sal in tên axaftin û nîqaşkirin. Piştî hingî jî, di nav jixwebaweriyekê de ji nîqaşkirin û axaftina wan em ê xwe nedin alî. Di demokrasiyan de ew boçûn û fikr û polîtîka bi ser dikevin ku desteka gel werdigirin. Em jî bibiryar in, bi duayên xêrê û desteka miletê me, pêvajoyê bigihînin encama dawîn."*

Akdoxan, ku çareseriya kêşeyê di çarçoveya bêkarîgerbûna çekan û demokratîkbûnê de dinirxand, destnîşan dikir ku hukumet makezagona nû *"wek derfetekê dibîne di çareserkirina gelek kêşeyên bicihbûyî û kronîk de". Li gorî Akdoxanî "pêşxistina azadî û mafên bingehîn tevkariyê dike di amadekirina jîngeheke heqane û birayane de. Hesta ayidbûnê ya*

*hemwelatiyên me pêş dixe. Tirkiyeya ku ji kêşeyên xwe yên bingehîn derbas bibe, dê bibe hêzeke herêmî û gerdûnî."*

Alîkarê serokwezîr Akdoxan, ku amaje dida serokkomar, digot ku ya esas tetbîq e û ji bo ku pêvajo berbiçavtir bibe, cext li ser wan geşedanan dikir ku divê rû bidin.

Daxuyaniyên ku li Dolmebaxçeyê hatin kirin nişan didan ku her du alî li ser vê yeke li hev kirine: D, di çarçoveyeke makezagonî de û li derdora pergaleke demokratîk wê muzakere/guftûgo berdewam bin, li heber vê gavê jî û li hember berdewambûna guftûgoyan "PKK tê vexwendin bo kongreyê ji bo ku li dewsa têkoşîna çekdarî siyaseta demokratîk bi cih bike".; van her du mijaran ew yek nîşan dida ku her du alî mutabiq in di van mijaran de.

## Pevçûnên Ku Gurtir Vegeriyan: Pevçûnên Nav-Bajaran û Bandorên Wan ên Sosyopolîtîk

Lê belê pêvajo, her wekî di civîna Dolmebaxçeyê de dihate pêşbînîkirin, pêşve neçû. Tam dihate gotin ku *"ew derazîng di kêşeya kurd de hatiye derbaskirin û kêşeya kurd ku ji rêya çek û şîdetê derketiye û ketiye derbasbûn bû bo rêya siyasetê"*, piştî civîna Dolmebaxçeyê wan tiştên ku rû dan, dawî li diyaloga du salî anî. Di encama wan geşedanên vê sala dawîn de ku di wê kronolojiyê de ku me di PÊVEKa 01'ê de daye, bêpevçûna du salî bi dawî bû; pevçûn ji çolê derbasî nav bajaran bûn, pevçûna 30 salî bi awayekî nedîtî sift û sol bûn û wêrankariyên mezin anîn holê.

### *Kuştî û Wêrankariyên Civakî*

Li gorî reqemên Serokatiya Erkana Giştî, ji roja 10'ê Adarê ve, bes li navçeya Sûrê ya Amedê 286, li Cizîrê 665, li Hezexê 125 û bi giştî 1076 endamên rêxistinê jiyana xwe ji dest dane.[3] Li gorî daxuyaniya PKK/KCK'ê di nav sala 2015'an de 261 mîlîtanên çekdar, 1250 leşker, 132 polîs û 13 leşkerên payeberz û bi giştî 1818 çekdarên dewletêkes jiyana xwe ji dest dane; (her roj kuştî zêde dibin). [4]

Li gorî wê raporê ku Gerînendetiya Giştî ya Ewlekariyê amade kiriye û pêşkêşî Wezareta Karên Navxweyî kiriye, hejmara wan kesên ku ketine ber qedexeya hatûçûyê mîlyonek û 300 hezar kes e. Li gorî raportê, di encama

**3** "Önemli Yurtiçi Olaylar", *Serokatiya Erkana Giştî*, 10.03.2016, http://www.tsk.tr/4_olaylar/4_2_onemli_yurtici_olaylar/onemliyurticiolaylar.html, Roja eksesê: 12.03.2016.
**4** "2015'in savaş bilançosu", *Özgür Gündem*, 04.01.2016.

pevçûnan de nêzîkî 100 hezar kes naçar mane ku terka xaniyên xwe bidin.[5] Li gorî daneyên hukumetê, hejmara wan hemwelatiyan ku naçar mane ji ber qedexeya hatûçûyê û operasyon û pevçûnên nav-bajaran terka xaniyên xwe bidin, ji dawiya meha Rrêbendanê ve gihîştiye 200 hezar kesî.[6] Mûezzînoxlu, ku Wezîrê Tenduristiyê ye, diyar kir ku ji ber bûyeran 355 hezar kes naçar mane ku koç bikin.[7]

Piraniya mezin a wan kesên ku ji şûn û warên xwe bûn, ew mexdûr in ku di salên 1990'î de hatine naçarkirin ji bo ku ji şûn û warên xwe derkevin. Piştî trawmeyeke mezin a civakî, bi zor û zehmetiyên mezin li qeraxên bajaran bi cih bûn û bi zor û zehmetiyên mezin jiyaneke nû ava kirin; lê piştî 20 salan dîsan ji şûn û warên xwe bûn.

Li gorî daneyên Weqfa Mafên Mirovan li Tirkiyeyê (WMMT), ji 16'ê Ttebaxa 2015'an heta 18'ê Tebaxa 2016'an, li Amedê (34 caran), li Şirnexê (9 caran), li Mêrdînê (11 caran), li Colemêrgê (5 caran), l1i Êlihê (2 caran), li Mûşê (carekê), li Xarpêtê (carekê) ku bi giştî herî kêm li 22 navçeyan, bi fermî 63 rojan bêmawe û bi dirêjahiya rojê qedexeya hatûçûyê hate ragihandin. Di dîrokên navborî de herî kêm 310 kesên sîvîl, li van navçeyên ku qedexeya hatûçûyê hebû jiyana xwe ji dest da ku ji van 32 zarok, 29 jin, 29 kes mezintir ji 60 salî bûn.[8]

Di gel kuştî û koça naçar, wêrankariyeke mezin a mekanî hate holê. Navçeyên wekî Cizîr, Sîlopiya, Sûr, Nisêbîn bi wî awayî hatin darûxandin ku pêwîst e ji nû ve bêne avakirin. Bi rastî, vê wêrankariya bajaran, rengvedana xwe di "Plansaziya Çalakiyan ya Rehabîlîtasiyon û Têkoşîn li dijî Terorê" de jî dît ku ji aliyê hukumetê ve hate aşkerakirin.[9] "Master Plan" a ku ji 10 sernavan pêk tê, madeya 6'em ji bo "vejandina bajaran" hate terxankirin û cexteke taybet li ser Sûra Amedê hate kirin ku tûşî wêrankariyeke mezin hatiye.[10]

Pêvajoya pevçûnan, jiyana sosyoekonomîk şehitand. Bo nimûne, li Sûra Amedê ku hezaran kargehan tê de kar dikir û xwedî zêdetir ji 50 hezar xebatkarî bûn, jiyana îqtîsadî bi temamî rawestiyaye. Karîgeriya Sûrê li ser bazarên derveyî Amedê jî heye; ji ber vê yekê jî karîgeriya xwe daye

**5** "5 İlçe kritik", *Hürriyet*, 23.12.2015.
**6** Selvi, Abdulkadir, "Başbakan'ın bölge programı", *Yeni Şafak*, 28.01.2016
**7** "355 bin kişi terörden göç etti", *Hürriyet*, 27.02.2016.
**8** Ji bo hemû raportê, bnr: Weqfa Mafên Mirovan li Tirkiyeyê (2016), "16 Ağustos – 18 Mart Tarihleri Arasında Sokağa Çıkma Yasakları ve Sivillere Yönelik Yaşam Hakkı İhlalleri", *TİHV*, 22.03.2016, http://tihv.org.tr/guncel-16-agustos-2015-5-subat-2016-sokaga-cikma-yasaklari-ve-sivillere-yonelik-yasam-hakki-ihlalleri/, Dîroka Eksesê: 22.03.2016.
**9** "Başbakan 'master planı' açıkladı", *Yeni Şafak*, 05.02.2016.
**10** Başbakan Davutoğlu Mardin'de eylem planını açıkladı", *Milliyet*, 05.02.2016.

ser herêmên dîtir û ev yek jî mezinahiya ziyanê nîşan dide. Metîn Gûrcan raporteke bihûrgilî ya wê ziyanê derxist ku li Cizîrê di navbera dîrokên 04-12'ê Îîlona 2015'an de hate holê. Li gorî Gûrcanî, maliyeta van pevçûnan, ku bi dirêjahiya qedexeya hatûçûyê rû dane, ji bo Tirkiyeyê 100 mîlyon lîreyê tirk e.[11] Bi heman şêweyî, wêrankariyên mekanî li Sîlopiyayê ku pevçûn sift û sol dibin, wek 82 mîlyon lîreyên tirk hatiye tesbîtkirin.[12]

## Encamên sosyopolîtîk ên pevçûnên nav-bajaran

Piştî ku pêvajoya çareseriyê bi dawî bû û nexasim piştî qedexeyên hatûçûyê ji 16'ê Ttebaxa 2015'an ve, ji ber pevçûnên nav-bajaran li gel wêrankariyên mirovî, civakî, mekanî û sosoyekonomîk her wiha ji aliyê sosyopolîtîk ve jî wêrankariyeke mezin hate holê. Ku em van wêrankariyan rêz bikin:

**1.** Polîtîkayên heyî yên şîdetê, li derveyî niyetên hukumeta AKP û PKK/KCK, binê polîtîkaya "siyaseta çareseriya navxweyî" bi awayekî lez hilkola/hildikole ku ji salên 1990'î ve hakim e ku di çareseriya kêşeya kurd de ji bo xwe sînorên Tirkiyeyê esas digire.

**2.** Projeya HDPê derbeyek mezin xwar ku derfeteke baş pêşkêş dikir ji bo entegrasiyona civakî û derbasbûna ji wê cudahiya ê ku pevçûnên 30 salî anîbû pê.

**3.** Piştî pêvajoya diyalogê ku ji du salan zêdetir kêşa, şîdet sift û soltir bû û qadên bajaran jî girte nav xwe; vê yekê jî ew bawerî lawaz kir ku bi rêyên demokratîk û aşitiyane çareseriyê esas digire. Çareseriya kêşeya kurd û avakirina aşitiya civakî îro dijwartir e ji duh.

**4.** Van pevçûnan bi qasî nav Tirkiyeyê di nav civaka kurdan de jî cudahiyeke mezin anî pê. Di nav wan taxan de bi sift û sol rûdana pevçûnên nav-bajaran ku taxên mexdûrên koça naçar a salên 1990'î bûn, di nav civaka kurdan de dabeşiya çînî kûrtir kir. Mehrûmbûna wan kesan ku di nav vê serdemê de ji şûn û warên xwe bûn, ji ber kêm û kasiyên hevgirtinê hem dabeşiya çînî kûr kir û hem jî şebekeya hevgirtina civakî jî hişt ku leztir darûxe.

**5.** Li gel dabeşiya çînî, dabeşiyên siyasî jî kûrtir bûn. Dema ku pevçûnên salên 1990'î em bînin bîra xwe, ji bo ku bi rêyên siyasî û demokratîk kêşeya kurd bê çareserkirin, levkirina komên ciyawaz ên siyasî xwedî girîngiyeke mezin bû. Pevçûnên nav-bajaran derbeyeke mezin li derfetên levkirinê da û pevçûnên siyasî û dabeşî mezin kirin.

**11** Gürcan, Metin, "Kent çatışmalarının ekonomik ve sosyal bilançosu: Cizre örneği", *T24*, 29.12.2015.
**12** "Terörün Silopi'ye faturası ağır", *Yeni Şafak*, 07.03.2016.

**6.** Qada siyasetê derbeyeke mezin xwar. Ji ber ku çareseriya kêşeya kurd, bi te'bîra popîler, girêdayî ye bi "girtina rêyên çiyayan, bi pêşxistina derfetên siyasetê li deştê", pêşxistina qada siyasetê xwedî nirxeke heyatî ye. Mixabin di gel siftûsolbûna pevçûnan, qada gotin û siyasetê bi rêjeyeke girîng bû teng. Ezmûna HDPê, mînakeke karîger e. HDP berî hilbijartina 07'ê Hezîrana 2015'an lîstikvanek bû ji bo çareseriya kêşeya kurd bi rêyên siyasî, ku her roj bihêz dibû û di parlamentoyê de jî bû partiya sêyem; bes îro bi rêjeyeke diyar karîgeriya xwe ji dest daye.

**7.** Bi qasî qada siyasetê, qada sîvîl jî derbeyeke mezin xwar. Di van salên dawîn de gelek RCSK (Rêxistinên Civaka Sîvîl) bi pêşengiya wan kesan hatibûn avakirin ku xwedî bîr û boçûnên ciyawaz bûn; ev RCSK di qadên gelek ciyawaz de dixebitîn. Van RCSK'yan bi wan xebatan, ku di gelek qadên kêşeyên ciyawaz de kirin, rol û risteke girîng gêran di normalîzebûna civakî de. Lê belê piştî ku pevçûn zêde bûn, qada sîvîl teng bû û RCSK'yan bêdengî daposî. Kêşeya kurd esasen bi berfirehkirina qada sîvîl dikare bê çareserkirin; ji ber vê yekê ji aliyê hemû aliyan ve divê li vê rewşê bi baldarî û bi fikar bê nêrîn.

**8.** Di çareseriya pevçûn û avakirina levkirinan de zêdebûna qadên gewr û bihêzbûna ektorên ku dikarin li gel aliyên ciyawaz biaxivin, gelek girîng e. Pevçûnên nav-bajaran, qadên gewr bi awayekî mezin teng kirin, derfetên rexnegirtin li aliyan kêm kirin û ew ektor bêdeng kirin ku li derveyî pevçûnan bûn û hatin/tên naçarkirin ji bo alîgirtinê.

**9.** Bi derbexwarina qada siyaset û sîvîl û ji ber tengbûna qadên gewr, her roj her ku çû/diçe dengê qada giştî, bi gotineke din dengê kolanan, hat/tê qutkirin.

**10.** Ji ber wêrankariyên sosyopolîtîk, hêvî ji wê fonksiyona siyasetê hate birîn ku çareserîsazkirin bû û bi temamî piştrastiya xelkê kêm kir ku li hember sazgeha siyasetê û siyasetemedaran hebû.

**11.** Mîlîtarîzebûna civakî her roj her ku çû zêde dibe. Di kurtemawe û dirêjemaweyê de ev rewş dê li gel xwe gelek kêşeyên giran ên civakî bîne. Li wan herêmên ku qedexeya hatûçûyê û pevçûn hene, ciwan û zarok rû bi rûyî mîlîtarîzmê dibin; ev mîlîtarîzm bipişt e ji bo hilberandina rîskên mezin ên civakî. Gelek zarok yan duçarî çek û şîdetê bûn yan jî çek û şîdet bi kar birin. Sibeh dusibeh eger çareseriyeke siyasî ji bo kêşeya kurd bê dîtin jî, ew zarok û ciwanên ku bi vî rengî peywendî li gel çekê girê dane, mumkun e ku hin cureşîdetên ciyawaz ên nesiyasî bigirine ber xwe û xwe di nav kombûneke civakî de bi cih bikin ku şîdetê ji bo xwe esas digirin. Ev yek wek hereşeyeke mezin li ber me disekine.

**12.** Cîbicîkirina rûbirûbûnê li gel raboriyê, pêkanîna dada civakî, jevhelalbûn, pêkanîna wekheviyê jixwe bi tena serê xwe karekî dijwar e û wek berpirsiyariyekê li ber ektoran disekine. Çareseriya siyasî ya kêşeya kurd, ji bo pêkanîna aşitiyeke rasteqîne dê destpêkeke girîng bûya. Pêkanîna wê aştiyê ku jixwe dijwar bû, îro piştî van pevçûnên nav-bajaran avakirina wê tûşî wêrankariyeke mezin bû. Çareseriya siyasî ya kêşeya kurd zêdetir dijwar bû.

**13.** Bi kurtasî, piştî wê qonaxa ku bi Newroza 2013'an dest pê kir, em ji wê gelek çûn paş.

## Pêvajoya Çareseriya 2013-2015'an Çima Tûşî Sernekeftinê Bû?

Piştî van wêrankariyan ku ji ber pevçûnên dawîn hatin pê, divê pirsa ku Pêvajoya Çareseriyê ya 2013-2015'an çima sernekeft, bê bersivandin ji bo ku kêşeya kurd ji rêya çek û şîdetê dubare bikeve ser rêya diyalog û guftûgoyê. Bersiveke rasteqîne ya vê pirsê, dikare tevkariyekê bike ji bo ku pêvajoya diyalog û guftûgoyeke nû ji nû ve saz bibe.

Gelek dînamîk hene di sernekeftina Pêvajoya Çareseriyê de; bes divê binê sê şaşiyên pêkhateyî bi taybetî bê xêzkirin: (1) bikaranîna demê, (2) xXumamiyeke zêde û (3) pPabendnebûn li teehudan. Pêvajo ji ber sirûşta xwe, gelek dijwarî vedihewandin. Şaşiyên pêkhateyî jî ku li vê yekê zêde bûn, pêvajo tûşî bêencamiyê bû.

### *Bikaranîna Demê*

Bikaranîna demê xwedî girîngiyeke cidî ye li erdnîgariyeke wekî Rojhilata Navîn ku dem bi lez diherike, şert û derfet her tim diguherin, hevsengiya hêzan, pozîsyon û tifaqa ektoran her kêlî dikarin biguherin. Çiku di navbera 2013-2015'an de, ji ber guheranên ku di asta nîştimanî û di asta herêmî de rû dan, hêz û zerfiyet û pozîsyon û tifaqa aliyên Pêvajoya Çareseriyê û di encama van de jî daxwaziyên wan bi rêjeyeke mezin guherîn.

Li Tirkiyeyê di qirara du sal û nîvan de xebatên girîng hatin kirin. Pêvajo bû civakî, fikrê aşitiyê bû fikrekî zal û ne bes be jî jêrxaneyeke huqûqî hate amadekirin. Bîranîna van destkeftan, pêwîstiyek e ji heqaniyetê. Hemû mawe tune nehate derbaskirin û hin xal hatin derbaskirin.

Di gel vê yekê, girêdayî li gel bikaranîna demê, du şaşiyên mezin hatin kirin: Ya yekem, belavbûna demê bû li demeke xumam. Di gava yekem de, ev yek, dikarî bê fêmkirin; bes piştî ku hate derekê diviya "cedweleke demê" bihata

çêkirin û kîjan gav dê kengî bihata avêtin, diviya bihata tesbîtkirin. Diviya raya giştî di vê mijarê de xwedî agahî bûya ku zexteke demokratîk li aliyan bikira ji bo ku karên diyarkirî di dema xwe de bihatana kirin. Ev nehatin kirin. Carinan hin dem hatin bilêvkirin, bes ev bi temamî kêfî bûn û tabî nebûn li tu kontrolekê.

Di qirara vê demê de, gelek bûyerên girîng rû dan. Kêşeyên nû hatin pêş, komên nenas ketin nav hevkêşeyê. Rojava, veguheriya meseleyeke peywendîdar li gel pêvajoyê. PYD, DAIŞ û peywendên wan, yekrast mudaxilî pêvajoyê bûn. Li herêmê hemû hevsengî guherîn. Pêvajo ji ber ku ne tomarkirî bû bi dîrokekê, vekirîtir bû bo karîgeriya van bûyeran. Pêvajoyê, li gel aloz û palozbûna peywendiyan û guherîna daxwaziyan û bidestxistina pozîsyoneke nû ji aliyê layenan ve, berxwedana xwe ji dest da û di dawiyê de birîneke kûr xwar.

Şaşiya duyem sebaret bi demê, ew bû ku li pêvajoyê bi hestyareke derasayî dihate nêrîn. Aliyan, armancên xwe yên polîtîk ên kurtemaweyî xistin pêşiya pêvajoyê. Helwesta aliyan ku berî 7'ê Hezîranê wergirtin, di vê peywendê de, têra xwe fêrker e. Bi dirêjahiya serdema hilbijartinê, her du aliyan jî bi temamî hevdu bi armanc girtin. Li dijî hevdu kempenî bi rê ve birin. AKP'ê li ser neteweperestiyê, HDP'ê jî li ser dijayetiya Erdoxan, xebatên xwe bi rê ve birin. Bi awayekî bihêz xwe bihartin ji xwedîderketin li pêvajoyê, zerar dan hevdu û binê wî zemînî hilkolan ku wan danîbû. Piştî wê civîna hevpar ku li Dolmebaxçeyê hate sazkirin, bi dirêjahiya çar mehan, bes hengavek jî nehate avêtin ji bo xwedîkirina pêvajoyê. Ku siyaset vekişiya, ya ku li her der û li her cihî çêdibû çêbû; ew valahî çekan dagirt ku siyasetê anî pê û pêvajo kete qeyranekê.

## *Xumamiya zêde*

Pêvajoyeke çareseriyê bi aliyên xwe yên giştî ji çar qonaxan pêk tê: têkilîdanîn, diyalog, guftûgo û çareserî. Pêwîstiya her qonaxekê bi demekê heye ji bo ku hundirê wê bê dagirtin. Tiştekî sirûştî ye, di kêliya yekem de naverok nikare bi hemû aliyên xwe ve bê destnîşankirin. Biryar li ser her mijarekê bi awayekî mitleq nikare bê wergirtin. Serê pêşîn, aliyên ku têkilî û diyalog danîne divê hev nas bikin. Alî divê bi awayekî muteqabil sînorên xwe bizanin, "çêdibe" û "çênabe"yên hev peyda bikin û jêktêgihîştin pêwîst dike.

Dema ku baş bê rêkxistin, xumamiya navborî fonksiyoneke "avaker" digire. Hê di destpêkê de rê li ber tengijeyan digire ji bo ku alî tûşî wan nebin, hin xetimînan derbas dike, ji bo ku pêvajo qebûleke giştî bigire, zemînê xweş dike. Lê belê umr û nirxeke xumamiyê jî heye. Di kurtemaweyê de dibe

alîkar, lê di dirêjemaweyê de kar nake. Dirêjkêşana xumamiyê ji hed bi der, pêvajoyê texrîb dike. Ji ber vê yekê, divê alî piştî ku pêvajoyê dema xwe girt, xumamiyê rakin û ji bo pêvajoyê wexteke diyarkirî û pêşbîniyekê saz bikin. Pêvajoya Çareseriyê li Tirkiyeyê jî li ser gotareke giştî ("Bila dayik negirîn", "Bila xwîn nerije", "Kêşe bi lêdan û hilweşandinê çareser nabin") ku her kesî dikarî qebûl bike, dest pê kir û hate qonaxeke diyar. Di 28'ê Sibatê de, di pêvajoyê de, çivanekeke girîng hate derbaskirin. Her du aliyan pêkve wêne girtin û rêgeha pêvajoyê destnîşan kirin ku dê pêvajo tê de biçe. Di civînê de du deq hatin xwendin: Yalçin Akdoxan li ser navê AKP, perspektîfeke giştî ya demokratîkbûnê anî ziman. Sirri Sûreyya Onder jî li ser navê HDP, 10 madeyên Ocelan beyan kirin.

Di vê qonaxê de diviya diyarnebûnî bi awayekî esxerî bihata kêmkirin û nexşerêyeke diyar bihata çêkirin. Lê belê di her du deqan de jî şopa vê yekê tune bû. Gotara hukumetê zêde giştî bû. Di eslê xwe de digot, "Em di rêya demokratîkbûnê de ne û her ku em di vê rêyê de ber bi pêş çûn dê çareseriya hemû kêşeyan  bê vedîtin." Tu tenzîmeke taybet a wê deqê tune bû ku li ser wê mijarê bû ku lê xebitîbûn, û muhtemelen ev yek bi kesî ecêb nedihat.

Bi heman şêweyî, 10 madeyên Ocelan jî ne bersivek bû ji bo pêwîstiyeke lezgîn. Celebîtiya Ocelan gelek berfireh bû. Ev qas meseleyên giran barkirin li guftûgoyekê, ji du aliyan ve xwedî rengekî bû ku zor dida pêvajoyê: Ya yekem, girêdana guftûgoyê bi van madeyan ve, di rastiya xwe de, nediyarkirina dahatûya guftûgoyê bû û çarenûsa peymaneke mumkun jî wek sala hingî lê dihat. Lê belê li holê, pêvajoyek hebû ku diviya roj berî rojê bihata bidawîkirin. Xeta bû girêdana pêvajoyeke bi vî rengî bi hin madeyan ve ku diviya ji bo wan hewleke dayimî û bêmaweyî bihata dayîn.

Ya duyem, eger komek li gel dewletekê li guftûgoyê rûne, divê nebêje ku hemû kêşe bila li gel min bên axaftin, ev yek helwesteke zehmetker bû li ser pêvajoyê. Ji ber ku her kêşe xwedî mixatebeke ciyawaz e û axaftina hemû kêşeyên civakê li gel komekê ku nûnertiya hemû civakê nake, nedikarî bihata guftûgokirin. Ji bo bidawîbûna pevçûnan hemû kêşeyên civakî wek merc danîn, kêşedar bû. Ji ber ku beşeke mezin ji kêşeyan, xwedî wî rengî bûn ku piştî ku çek hatin danîn di nav siyaseteke demokratîk de dikarîn bihatana çareserkirin.

Esasen, ya ku piştî 28'ê Sibatê li Tirkiyeyê diviya bihata kirin, rakirina xumamî û zelalkirina pêvajoyê bû. Her du aliyan ji hevdu çi dixwestin, diviya bi awayekî zelal danîna ser maseyê. Çek kengî û dê çawa bêne danîn? Rewşa huqûqî ya endamên PKK dê çi lê were? Derbasbûn bo nav jiyana siyasetê dê çawa bê tenzîmkirin? Kîjan qanûn dê biguherin? Li kîjan qadê dê qanûnên

nû bêne derxistin? Ev hemû dê heta kengî bêne qedandin? Bersiva pirsên bi vî rengî ji aliyê her kesî ve dihate meraqkirin; û diviya bersivên şênber û rasteqîne bihatana dayîn ku li ser mutabiq bin. Ji ber ku di vê yekê de kêmasî hebû, pêvajo negihîşte serkeftinê û gihîşte binbestê.

### *Pabendnebûn li teehudan*

Li gel rastbikarneanîna demê û ranekirina xumamiyê, şaşiyek dîtir a girîng jî ku pêvajo gihande binbestê, pabendnebûna aliyan bû li gotinên xwe û/ yaxud bêdil tevgerkirin bû.

Piştî pevçûnan, di pêvajoyên guftûgoyan de alî asan bi asan sozê nadin. Ji ber ku ji aliyê din ne bawer in, naxwazin xwe girê bidin û/yaxud di asta herî jêr de tevger dikin. Lê belê di cihekî de ji bo ku pêvajo pêşve biçe soz divê bi awayekî muteqabil bên dayîn û divê pabend bin li teehudên xwe. Pebendbûn li teehudên xwe, berî her tiştî, di navbera aliyan de pira baweriyê çêdike. Bi gaveke biçûk aliyê ku dibîne muxatabê xwe heqane tevger dike û ya ku dikeve ser xwe pêk tîne, di dema avêtina gavên cidî û mezin de bêhtir wêrek tevger dike. Her destkeft, wan îtîrazkaran ji hêzê dixe ku di her du aliyan de hene. Hêza wan koman lawaz dike ku alîgirê tundiyê ne di her du aliyan de. Ew fikirê gel bihêz dibe ku sebaret bi pêşveçûn û biencambûna pêvajoyê ye. Pabendbûn li ser sozên dayî, hem desteka girseyî zêde dike û hem jî levkirina aliyan mumkun dike û mayindebûna wê peymanê pêk tîne ku hatiye girêdan.

Hevdîtin bes hingî bi ser dikevin ku encamên pratîk pêk bên. Li rexmî ku hevdîtin hebin eger encamên pratîk neyên bidestxistin, hingî ew tîroj nayê dîtin ku li dawiya tûnelê heye. Pêvajo diweste. Bendewarî datê, şert û merc têk diçin. Pêvajo, êdî ne wek rêyekê tê dîtin ku ber bi aştiyê diçe, berevajî vê, wek rêyekê tê dîtin ku pevçûnan paşve dixe. Ew girseyên ku baweriya wan têk çûye, ji pêvajoyê eciz dibin. Alî mitleqe sedemekê peyda dikin ji wan tevgerên xwe re ku pêvajoyê qut dikin. Lê belê, di dawiyê de, ew sozên bicihnehatî rê li ber peymanekê digirin.

Yek ji girîntirîn sedeman ku Pêvajoya Çareseriyê li Tirkiyeyê ragirt, nesekinîn bû li ser sozên xwe. Sê soz hene ku li ser hatine rawestandin: Temambûna derketina derveyî welêt, bidawîkirina wan çalakiyan ku ewlekariya giştî têk didin û rîayetkirin li Beyannameya Dolmebaxçeyê.

Alî sebaret bi vê mijarê, çîrokên ciyawaz dibêjin. Angaşta her aliyî ew e ku min ya pêwîst kiriye, bes aliyê din ev yek nekiriye û pabend nebûne li teehudên xwe; ji ber vê yekê jî pêvajo xistine rîskê. Her du alî xwe bêguneh

dibînin û hemû tawanan dixe stûyê aliyê din û tiştên erênî li ser xaneya xwe dinivîse û tiştên nerênî li ser aliyê din dihesibîne.

Bo nimûne, hukumet dibêje ku PKK soza wê yekê daye ji bo ku hêzên xwe yên çekdar vekişîne derveyî sînoran; lê belê piştre li hin geşedanan nêriye û dest ji vê yekê berdaye. Heçî PKK ye, dibêje hukumetê soz daye ji bo ku qanûnan derxe li ser vekişînê, bes li ser vê yekê nesekiniye. Dîsan, PKK li ser beyannameya hevpar a Dolmebaxçeyê dibêje ku hukumetê, ji ber hilbijartinê, Dolmebaxçe daniye ser refikan. Heçî hukumet e, angaşta wê ew e ku li Dolmebaxçeyê li ser vekişînê, dîrokeke teqez hatibû destnîşankirin; ancax PKK pabend nebû li vê dîrokê.

Tunebûna lijneyeke çavdêr/temaşeker, ku bikare hemwelatiyan bi awayekî rast û karîger ji Pêvajoya Çareseriyê agahdar bike û teehudên aliyan bişopîne, wisa kiriye ku alî pabend nebin li teehudên xwe; di vê mijarê de zext û kontrola civakî lawaz kiriye.

### *Avakariya Pêvajoya Çareseriyê*

Di vê mijarê de, divê ew yek bê destnîşankirin ku kêşeya bingehîn, di avakariya Ppêvajoya Ççareseriyê de ye. Pêvajoya diyalog û guftûgoyan, bi mekanîzm û ektorên xwe ve, ji ber ku bi awayekî karîger zerfiyeta guftûgoyan destnîşan nekir û mekanîzmên multiple pêk neanîn, bûn sedem ku Pêvajoya Çareseriyê bi dawî bibe ku li ba civakê hêviyeke mezin afirandibû.

Di vê serdemê de, ew hevkêşeyên ku di asta herêmî de pêk hatin, bandoreke nerênî li Ppêvajoya Ççareseriyê kir. Şerê navxweyî ku li Sûriyê pêketibû, her ku çû mezin bû. DAIŞ gurttir bû. Kurdan li herêmên xwe herêm/kantonên de facto ava kirin û peywendiyên nû danîn li gel DYA û Rûsiyayê. Van hemû geşedanan –li gel wan şaşiyan ku li jor hatin xulasekirin- pozîsyona aliyan guhart, zerb li peywendiyên wan ên baweriyê da ku jixwe gelek hestyar bûn û bû sedem ku ev şepola şîdeta bajarî dest pê bike ku ev heşt meh in em şahidiya wan dikin.

Wek dawî, divê ew têbînî li ser wê yekê bê danîn ku aliyan ji aliyekî ve diyalog dimeşandin û ji aliyê din ve jî di nav amadehiya Plana B'yê de bûn li hember îhtîmala têkçûna pêvajoyê. Li rexmî pêvajoya diyaloga du salî, di nav demeke kin de, li nav bajaran rûdana pevçûnên bi vî rengî tund, wê yekê nîşan dide ku ji bo her du aliyan çareseriya siyasî hêşta nebûye takebijarde û her du aliyan planeke B'yê amade kirine ku pevçûn jî di nav de ye.

## Rêya Bêserkeftî

Pêvajoya Çareseriyê ya 2013-2015'an bi sernekeftî bi dawî hat. Mixabin em dîsan û ji nû ve ketin nav pêçeke şîdetê. Piştî Cizîr, Sûr, Enqereyê di peywenda kêşeya kurd de kar û bar her roj her ku diçin xirabtir dibin. Derazîng her roj yek bi yek tên derbaskirin. Dibe ku em hêşta nehatine ser wê xalê ku jê veger tune ye. Lê belê piştî teqîna 17'ê Sibata 2016'an li Enqereyê, nîşandana PYD/YPG wek kiryara vê teqînê ji aliyê hukumetê ve û ew dîmenên Cizîrê ku piştî pevçûnan derketin û pêşxistina tifaqeke nû ya PKK/KCK'ê bi navê "Tevgera Şoreşger ya Yekgirtî ya Gelan" û herî dawî ew çalakiya erîşa ku li Ankara Gûven Parkê pêk hat, wê yekê nîşan dide ku em gav bi gav nêzîkî wê xalê dibin.

Ew gotin ku li ser aşitî û çareseriya siyasî ne, nayêne bihîstin û bênirx bûn. Lê belê ji bilî bibîrxistina wê yekê ku ev rê ne tu rê ye, tu bijardeyeke me nîn e. Çiku serkeftiyê vê rêyê tune ye, lê belê windahî dê gelek binin. Berî ku em wan pêşniyaran, ji bo ku em ji vê rêyê derkevin, pêşkêşî alî û raya giştî bikin, em dixwazin vê yekê bi çend argûmanan nîqaş bikin û nîşan bidin bê ka çawa serkeftiyê vê rêyê tune ye.

## *Binbesta[13] PKKê*

PKK bi pevçûnên nav-bajaran nikare rêyekê veke ji bilî vegerîna ser maseyê. Em dikarin sê argûmanan destnîşan bikin:

**1.** Zaniyariyên nav rêxistinê, di wî aliyî de ne ku bi rêbazên leşkerî û şîdetê çareserî çênabe. Ev zaniyarî, di wan deqan de ku rêxistinê di salên 1980'yî de stratejiyên xwe tê de vedigotin û di demên nêzîk de jî di wan daxuyaniyên rayedarên KCKê de ku li ser bidawîhatina qonaxa çekan bûn, hene. Bi heman şêweyî, mijara sereke di bangewaziyên Ocelan de ku çi di Newroza 2013'an de û çi jî bi dirêjahiya Pêvajoya Çareseriyê kirin, ew yek bû ku bi şîdetê çareserî çênabe.

**2.** Ezmûnên Iraq û Sûriyê, ji bo kurdan gelek fêrker in. Pirsiyarek heye ku divê li ser raweste bê kirin: Gelo kurd, di van her du welatan de, di bin kîjan şert û mercan de bi hêz/zorê dikarin li herêmên xwe serweriyeke terîtoriyal ava bikin? Ezmûna Iraq û Sûriyê, wê yekê îşaret dike ku di vê mijarê de sê dînamîkên diyarker hene:

**a.** Dewleta navendî, anku birêveberiya Bexda û Şamê, rû bi rûyî qeyraneke hebûn û tunebûnê bûn.

**13** Binbest: Bi wateya "impasse"a îngîlîzî û "çıkmaz"a tirkî bi kar hatiye

**b.** Li derveyî kurdan, neseqamgîriyeke siyasî û serhildanê li seranserî welêt dest pê kir.

**c.** Hêzên navdewletî yekrast daxil bûn.

Rewşa heyî li Tirkiyeyê, ji van her sê dînamîkan ciyawaz e. Tirkiye; endamê NATOyê ye, xwedî aboriyekê ye ku li cîhanê 17'emîn e û welatek e ku %55-60 ji bazirganiya xwe ya derekî li gel Rojava dike. Ji ber vê yekê; ew rewşa ku ji bo Iraq û Sûriyê derbasdar e, ji bo Tirkiyeyê ne derbasdar e; divê ew yek bê dîtin ku rêbazên ku li Iraq û Sûriyê kar dikin, li Tirkiyeyê kar nakin.

Di gel vê yekê, her çend kurd li Iraqê ji 1991'an ve, wek de facto, xwedî serweriyeke terîtoriyal bin û li rexmî ku desteke DYA'yê aşkera digirin, hê jî ji bo serxwebûnê ew rê nekudandine ku dixwazin bikudînin. Li Sûriyê ev pênc sal in şerekî navxweyî heye û hê jî li holê çareseriyek tune ye. Sûriye di gel axê bûye yek. Bi sedan hezar mirovî, jiyana xwe ji dest dan. Bi mîlyonan mirov naçar man ku terka xanî û şûn û warên xwe bidin. Îro, hemû nêzîkatiyên maqûl, dibêjin ku li Sûriyê çareseriyeke leşkerî ne mumkun e. Di gel hemû mobîlîzasiyonên xwe yên leşkerî û desteka aşkera ya ABD û Rûsiyayê, ew yek hêşta nayê zanîn bê ka kurd dê bikarin kantonan biparêzin an na.

3. Wek dawî, dikare  li wan pevçûnên nav-bajaran bê nêrîn ku ev heşt meh in rû didin. Piraniya xelkê piştgirî neda pevçûnên nav-bajaran. Xelk li pişt berîqet û xendeqan ranewestiya. Helbet hem sedemên vê yên îqtîsadî (astengbûna çîna navincî bo mîlîtanbûnê) û hem jî sedemên huqûqî (pakêta ewlekariya hundurîn ku “rejîma cezadanê” berbelavtir kir, wisa kir ku kolan bêlivûtevger be) hene. Bes sedema diyarker, siyasî ye; ji ber ku xelk dibêje ku rêyeke dîtir mumkun e. Li şûna ku parlamento, şaredarî, şebekeyên ragihandinê, şebekeyên RCS û gelek amrazên dîtir hebin, hilbijartina wê bijardeyê ku dibe sedema wêrankariye, li ba xelkê qebûl negirt.

Her wiha gel bîr bi wê neliheviyê biriye ku di navbera armancên siyasî yên ragihandî û rê û rêbaz û maliyetê de heye. Eqlê mutewesit ê kolanan, wê yekê pêşbînî dike ku piştî pevçûnên heyî yên nav-bajaran dê alî vegerin ser maseyê û di vê çarçoveyê de vê pirsiyara rewa dikin: “Madem rêyeke dîtir tune ye ji bilî ji nû ve vegerê bo ser maseyê, hingî ev çend wêrankarî ji bo çi?”

## *Binbesta Dewletê*

PKK bi şîdetê nikare di vî şerî de bi ser keve; bi heman şêweyî dewlet jî bi şîdetê nikare bi ser keve. Dewleta ku guftûgoyan nahesibîne, ne bi kêşeya

kurd dikare ne jî dikare wê çareser bike. Ji ber ku:

**1.** Dewlet wek normatîv nikare bi ser keve. Çiku ew kurdên AKP'yî jî tê de, di nav kurdan de levkirineke bihêz heye ku dibêje ev kêşe ne kêşeyeke teror û ewlekariyê ye. Ev yek jî çareseriyeke siyasî li kêşeyê ferz dike.

**2.** Di wan pevçûnan de ku ji 1984'an ve ye berdewam dikin, dewletê hemû rêbaz xebitandin ji bo ku asayişê pêk bîne. Dikare bê gotin ku tu ezmûnek nema ku dewletê nexibitandibe. Gelek caran pakêt hatin vekirin ji bo têkoşîn li gel terorê; bes ji van yekê jî çareserî pêk neanî. Dewlet ji ber vê yekê, her wekî berê îro jî, bi vê stratejiyê nikare bi ser keve.

**3.** Divê ew yek neyê jibîrkirin ku HDP û DBP ya ku nûnertiya siyaseta sereke ya kurd dike, xwedî bingeheke civakî ya bihêz e. Bi gotina dewletê "HDP'ya dirêjeya rêxistina terorî" pênc mîlyon deng digire. Beşeke girîng ji van dengan wek "girseya neguhêr" tê terîfkirin ku vê destekê vedihewîne. Fikir li wê yekê nikare bê kirin ku dewlet vê girseyê bi tedbîrên ewlekarane bîne rê.

**4.** Siyaseta sereke ya kurdan, ne tenê xwe dispêre bingeheke civakî ya bihêz, di heman demê de bi awayekî girîng xwedî bingehên sazgehî ne. Di vê mijarê de tenê parlamento, 11 şaredariyên parêzgehan bi sê metropolan û nêzîkî 10 TV'yan li ber çavan bê girtin, bes e.

**5.** Divê ew yek neyê jibîrkirin ku PKK xwedî kapasiteya mobîlîzasiyoneke leşkerî ye. PKK nekarî serhildaneke çekdarî ya gel pêk bîne. Lê belê xwedî çavkaniya mirovî û lojîstîk û ezmûn e ku bikare mobîlîzasiyona leşkerî hemîşe bîne pê.

**6.** Serkeftinên leşkerî yên dewletê, her wekî ku tê payîn, nikarin PKK'ê xelas bikin; wê ji nû ve hildiberîne. Di nav PKK'ê de, ji aliyê vehilberîna sazgehî û mezinbûnê ve, "gotara vejînê" têrî xwe karîger e. Hetta di vehilberîna nasnameya polîtîk de ew "berdêl" cihekî navendî digire ku li ser çiya-gor-zindan-mişextiyê hatiye sazkirin. Her ku dewlet serkeftinên leşkerî bi dest tîne, çiya û gor û zindan û mişextiyê ji nû ve hildiberîne. Anku, PKK'yê ji nû ve hildiberîne; hem jî bi awayî ku mezintir dike.

**7.** Cuda ji PKK û tevgera sereke ya kurdan, herî kêm gelheyeke 15 mîlyonî ya kurdan heye. Herî kêm nîviyê vê gelheyê projeya komarê erê nake. Texeyuleke wan a ciyawaz a civakî heye. Her çend çemkên ciyawaz ên wekî netewe, milet, gel bi kar bîne jî, kurdayetiyê wekhev dibîne li gel erebîtî û farisîtî û tirkîtî û germenîtiyê; û dawa wekheviyê dike.

**8.** Kurd; li ser beşeke nêzîkî %15 ji erdnîgariya Tirkiyeyê, li ser erdnîgariyeke yekparçeyî, piraniyê pêk tînin. Li her aliyekî vê herêmê xwîşk û birayên wan dijîn. Li Îranê parêzgeha Kurdistanê, li Iraqê Hukumeta Herêma Kurdistanê, li Sûriyê jî kanton ku mêldar in ji bo veguherînê bo federasiyonê. Hevkêşeya jeopolîtîk ya kêşeya kurdan ji zû ve ye guheriye; û ya herî girîng, di navbera kurdan de hevkariyeke pir-ektorî û pir-sektorî û sînor-şikênî heye ku nikare bê miqayesekirin li gel salên raborî.

Pêwîst e em rêyeke dîtir peyda bikin. Ev hêşta mumkun e. Em ê di beşa dawîn de wan pêşniyaran bidin ku me fikir ew e ku dê tevkariyê bikin li avakirina vê rêyê.

## Encam û Pêşniyar bo Polîtîkayê

> *"Eger pevçûnek, her wekî di kêşeya kurd de bi dehan salan kêşabe, ji bo çareseriya wê gelek teşebus divên. Di raboriyê de peydanekirina çareseriya wê, nayê wê wateyê ku nikare bê çareserkirin; bes divê zêdetir hewl bê dayîn."*

Ev gotinên li jor, yên Jonathan Powell in ku di navbera salên 1997-2007'an de li Îngîlistanê wek serguftûgokar di çareseriya Îrlendeya Bakur de rol û risteke mezin gêraye. Powell di pêşgotina wê kitêba xwe de, ku ezmûnên xwe yên dewlemend parve kirine li ser aşitî û çareseriya pevçûnan, binê sebrê xêz dike wek dersa yekem. Di vê beşê de, agahdariyeke gelek cidî dide: Peymana Belfast yan jî bi navê xwe yê popîler Peymana Îna Bixêr, ku di sala 1998'an de di navbera Îngîlistan û IRA'yê de hatiye îmzekirin, gelek dişibiya Peymana Sunningdale ku di sala 1973'an hatiye îmzekirina û hukmên parvekirina desthilatdariyê vedihewandin. Piştî serdemeke 25 salî ya xwînîn, alî li ser çarçoveyeke gelek manendî hev gihîştin levkirinê.

Piştî serdema pevçûneke 30 salî, ji bo ku kêşeya kurd ne bi çek û şîdetê bi çareseriyeke siyasî çareser bibe, mewda(mesafe)yeke girîng hatibû kudandin. Tam jî ku ji demên berê zêdetir nêzîkî çareseriyeke siyasî bûbû ku dê çek bi temamî ji rojevê derxistana, îro em hevrûyî şepoleke şîdetê ne ku bi temamî dike "siyaseta çareseriyeke hundurîn" ji holê rake ku ji salên 1990'î ve heta îro hatiye. Ji bo ku her wekî li Îrlendeyê em 25 salan ji dest nedin û ji bo ku ji van kuştî û wêrankariyan zêdetir kuştî û wêrankarî rû nedin, di serî de ektorên siyasî û piştre civak em naçar in ku rêyeke din peyda bikin.

Di vê rê-gerînê de em xwedî du palpiştan in: Yekemîn, piraniya mezin ya xelkê piştgiriya wê yekê dike ku çek ji holê rabin û aşitî bê sazkirin. Gelek rehendên kêşeya kurd hene ku pêwîst e bêne çareserkirin. Levkirina civakî hema hema

ava bûye ku dibêje; ji bo çareserkirina kêşeyan, pêwîstî bi şîdetê tune ye û divê çareseriya kêşeyan di nav siyaseteke demokratîk de bê pêkanîn.

Duyemîn, piraniya xelkê li ser wê baweriyê ye ku çareseriya kêşeya kurd, dikare di nav yekparçeyiya Tirkiyeyê de bê çareserkirin. Binyada civakî ya Tirkiyeyê vê yekê ferz dike û wê yekê dizane ku çareseriyeke bi çek û şîdetê, dê maliyeteke mezin derxe ji bo hemû beşên civakê. Ji ber ku ji bo vê yekê derfeteke mezin bû, ji aliyê xelkê ve piştgiriya Pêvajoya Çareseriyê dihate kirin.

Armanca van pêşniyarên li jêr pêşkêşkirî, ew e ku tevkariyê bike li vê rê-gerînê:

***Bêpevçûnî û paqijkirina bajaran ji çekan***

**1.** Pêwîst e bi lez bêpevçûnî bê pêkanîn ji bo pêçana birîn û dabînkirina mexdûriyetên pevçûnên nav-bajaran.

**2.** Divê ji hengavên wekî rakirina parêzbendiyan û nîqaşên girtina partiyan bê bihartin ku dê di kêşeya kurd de guloka şîdetê mezintir bikin û tehdeyê bidin jevbaweriyê. Di vê mijarê de, ewil partiyên siyasî û piştre hemû ektorên peywendîdar divê bi berpirsiyarî hereket bikin.

**3.** Ji bo pêkanîna rewşa bêpevçûniyê, di serî de ew navçe û piştre ew bajar divê ji çekan bêne paqijkirin ku tê de pevçûn sift û sol bûne û wêrankariyeke mezin hatiye pê; bi gotineke din divê bêne demîlîtarîzekirin. Di vê mijarê de, PKK/KCK divê ji bajaran mîlîtanên xwe yên çekdar vekişîne û divê dawî li wê fikirê bîne ku bi xendeq û berîqatan pêkanîna "hakimiyeta qadan" e. Ji aliyê din ve, divê hukumet dawî li qedexeya hatûçûyê bîne her wekî li Cizîr û Sûrê tê dîtin ku bi mehan dikêşe û hêzên xwe yên leşkerî/polîs wekî hêzên taybet şûnde vekişîne û hêza polîsan divê biçe nav wî sînorî ku pêkanîna kar û barên asayişa normal e.

**4.** Ji bo wan dora 2 hezar hemwelatiyan ku piştî bêpevçûniyê jiyana xwe ji dest dane, li seranserî welêt divê rojek an jî sê rojan şîn bê ragihandin.

***Veavakirina civakî li qadên pevçûnan***

**1.** Ji bo pêçana birîn û dabînkirina mexdûriyetên pevçûnên nav-bajaran û veavakirina civakî; di serî de li navçeyên wekî Sûr û Ferqîn û Cizîr û Nisebîn û Sîlopiya û Hezexê û her wiha li wan deran ku pevçûn sift û sol bûne, divê di asta welêt de seferberiyek bê ragihandin. Di vê çarçoveyê de;

**2.** Divê ev navçe wek herêmên karesata civakî bêne qebûlkirin.

**3.** Hukumet divê wê pîlanê, ku di 05'ê Adara 2016'an de ragihande raya giştî, bi hevdîtinkirin li gel birêveberên xwecihî û saziyên civaka sîvîl û rûspî û ektorên peywendîdar, revîze bike.

**4.** Divê lêpirsîn û vekolîneke karîger bê meşandin li ser kuştî û binpêkirina mafan. Di vê mijarê de, divê di bin banê meclîsê de komîsyonek bê danîn. Her wiha ji bo ku bi hemahengî bixebite li gel vê komîsyonê, divê komîsyoneke dîtir bê danîn û divê pêk bê ji nûnerên chambersodeyên pîşeyan, rêxistinên civaka sîvîl, civatên dînî, rûspî/aqilmendan.

**5.** Li bajarên navborî bi armanca tevkarîkirin li pêvajoya avakirina fezayî mekanî û sosyoekonomîk, divê yekeyaneke taybet di bin banê Ajansên Geşepêdanê de bê avakirin; ji bo van yekeyan divê çavkaniyên taybet bêne terxankirin û di bin banê van yekeyan de bernameyên taybet bêne pêkanîn.

**6.** Ji bo her navçeyekê divê bira-bajarek hebe ji bajarên rojava; ji bo avakirina navçeyê divê çavkaniyên bira-bajêr ên wekî îqtîsadî û civakî û sazgehî û zaniyarî û hwd. bêne seferberkirin. Divê torên hevkariyê bêne dirûtin di navbera tesîsên giştî û civaka sîvîl û kert(sektor)a taybet ên bajarên navborî de.

**7.** Li kêlek bira-bajaran, di serî de chambers odeyên pîşeyan û piştre rêxistinên civaka sîvîl ku di qada civakî, îqtîsadî, çandî de dixebitin, divê mobîlîze bibin û torên hevgirtinê bidirûn.

**8.** Wek dawî, divê tesîsên ragihandinê beşdarî vê seferberiya avakirina civakî bibin ji bo ku di navbera hemwelatiyan de torên hevgirtinê bêne dirûtin.

***Pêkanîna zemînekî bo pêvajoya guftûgoyeke nû***

**1.** Li gel bêçekkirina bajaran û  xebatên avakirina civakî divê pêvajoyeke nû ya guftûgoyan bê destpêkirin. Di vê çarçoveyê de;

**2.** Ji bo derketin ji vê rêyê ku nek serkeftiyê wê belku têkçûyê wê heye divê fikir li çareseriya siyasî be ku ji bo her du aliyan destkeftên wê hene.

**3.** Ji bo derbasbûn ji kêşeya jevnebaweriyê, divê alî gavên sembolîk biavêjin. Bêçekkirina bajaran, rawestandina operasyonan, bidawîkirina nîqaşa rakirina parêzbendiyan dê di vê mijarê de zemînekî girîng bîne pê. Di gel vê, ji bo pêkanîna hawîrdora jevbaweriyê divê lijneyek li gel Ocelan hevdîtinê pêk

bîne ku pêkhatî ji aqilmend û rojnameger yan jî ji rewşenbîran be; her wiha peywendî yan jî hevdîtinek li gel birêveberiya kantonên kurdan li Sûriyê û reçavkirin qanûna bi hejmara 6551 a “Bidawîkirina Terorê û Hêzdarkirina Yekgirtina Civakî” û beyana niyetê ya PKK/KCK bo destberdan ji çekan dê ji bo avakirineke wiha tevkariyeke girîng bike.

**4.** Ji bo çêkirina lîstikekê ku her du alî jê qezenç dike (win-win game)ekî berî her tiştî divê armanceke siyasî ya hevpar bê destnîşankirin ku alî divê mutabiqî wê bin.

**5.** Li ser vê peywendê, nîqaşên makezagona nû û guhartina rejîmê divê wek derfet bêne nirxandin ji bo destnîşankirina vê armanca siyasî ya hevpar.

**6.** Armancên siyasî yên wekî pergala serokatiyê û pergala parlamenter û xweserî/xwecihîsazî divê li ba raya giştî bi awayekî karîger bên nîqaşkirin. Her çend ev mijar ji mêj ve ye di rojevê de ne jî, lê belê eventej û dezeventejên van pergalan û aliyên wan ên karîger û kêşedar nayêne zanîn bê ka çi ne. Di vê mijarê de, di serî de partiyên siyasî û piştre akademî û medya û ektorên dîtir ên civakî  di vê yekê de rol û risteke karîger gêrane.

**7.** Xweseriya ku tevgera sereke ya kurdan daxwaz dike, bi gotineke dîtir desantralîzasiyona xwecihî/herêmî, hem di pergala parlamenter de û hem jî di pergala serokatiyê de mumkun e. Di vê mijarê de divê ew nêzîkatî bi esas bê wergirtin ku ji her du bijardeyan re vekirî ye.

**8.** Ji bo derxistina rojeva guftûgoyê ji xumamiyê, divê ev çar mijarên girîng esas bên wergirtin ku ji ezmûnên berê hatine pê: (1) Reforma birêveberiya giştî û desantralîzasiyon, (2) Plûralîzma zimanî/çandî, (3) Berfirehkirina qada siyasetê û (4) Bêçekdarkirina PKK’ê.

9. Divê ziman bê bêçekdarkirin. Hemû alî, di serî de hukumeta AKP û HDP û PKK/KCK û piştre partiyên siyasî, medya, rêxistinên civaka sîvîl, akademî divê zimanekî levhatin û çareseriyê pêk bînin.

### *Pêvajoya guftûgoyeke nû, mekanîzm û ektorên wê*

**1.** Bi hengavên li jor, hawirdora pêwîst ji bo pêvajoya guftûgoyeke nû dê pêk were. Di vê mijarê de, serê pêşîn divê avakariyeke karîger bo pêvajoya çareseriyê bê pêkanîn. Di vê çarçoveyê de, divê mekanîzmeke beşdar bê avakirin, divê avakariyeke sazgehî/rêxistinî bê avakirin ji bo ku alî ji aliyê ektoran ve bikarin bêne kontrolkirin.

**2.** Divê meclîs wek wê qada siyasî ya sereke bê nirxandin ku pêvajoya çareseriyê tê de tê birêvebirin. Divê komîsiyoneke meclîsê bê avakirin ji bo ku hemû pêvajoyê bi rê ve bibe. Ji bo ku komîsiyon bi awayekî karîger bixebite, ji rêbazên wekî yekdengî yan jî piraniyê zêdetir divê rêgeza piraniya besker (qualifield) bê esas wergirtin.

**3.** Di sernekeftina Pêvajoya Çareseriyê de, dema ku bandora piştgirînedana opozîsiyonê di serî de ya CHP bi dîqet bê wergirtin, hingî di pêvajoyeke nû de, divê beşdarkirina opozîsiyonê bi girîng bê nirxandin. Di pêvajoyeke nû de beşdarbûna MHP bi awayekî karîger zehmet xuya dike; ji ber vê yekê, bi awayekî karîger beşdarbûna CHP li pêvajoya çareseriyê, xwedî girîngiyeke cidî ye. Bi beşdariya CHP, pêvajo dê bêhtir hêzdar û tendurist bê birêvebirin.

**4.** Ezmûnên cîhanê, wê yekê nîşan didin ku di çareseriya pêvajoyên pevçûnan de aliyê sêyem, derfeta çareseriyê zêdetir dike. Li ser vê peywendê, divê Lijneyeke Çavdêriyê bê pêkanîn ku her du alî jê bawer in û hestyariyên her du aliyan bi dîqet werdigire. Ji bo ku alî pabend bin li teehudan, hilgirtina vê gavê xwedî girîngiyeke cidî ye.

**5.** Li gel partiyên li meclîsê, divê beşdarkirina komên din ên siyasî û tevgerên civakî û rêxistinên civaka sîvîl li maseya çareseriyê, bê pêkanîn.

**6.** Li ser vê peywendê, divê mekanîzmên guftûgoyê yên civakî bêne avakirin, ezmûnên wekî Meclîsa Aşitiyê ya Tirkiyeyê divê bi dîqet bê wergirtin û li hemû bajaran bi pêşengatiya rêxistinên civaka sîvîl Konseyên Levkirin û Çareseriyê divê bêne avakirin.

**7.** Bidîqetwergirtina ezmûna mirovên aqilmend, serbixwe ji aliyan, divê Lijneya Levkirin û Çareseriyê bê avakirin ji bo ku bikare di asta welêt de hemû pêvajoyê bişopîne.

**8.** Divê beşdarkirina wan ektorên polîtîk ên kurd û partiyên siyasî û camîeya civaka sîvîl û civatên dînî û rûspî bê pêkanîn ku li derveyî siyaseta sereke ya kurdan in. Di vê mijarê de, bêyî ku hukumet û siyaseta sereke ya kurdan bê çaverêkirin, divê ev ektorên navborî mekanîzmên guftûgo û diyalogan bêne ava bikin kirin û ji bo çareseriyê divê hem li tevgera sereke ya kurdan û hem jî li hukumetê zext bikin. bêne kirin.

**9.** Medya divê di pêvajoya çareseriyê ya nû de çalakane rol bigêre û Medyaya Aşitiyê yan jî Medyaya Levkirin û Çareseriyê bê pêkanîn. Li ser vê peywendê, di medyaya sereke û di medyaya nivîskî û dîtbar de dikare her tim û rêk û pêk xebatên wekî bernameyên aşitiyê, bulten/rojnameya aşitiyê, Bultena

Gewr ku bala xwe li ser kêşeyên jinan e, Bultena Kesk ku bala xwe li ser ekolojiyê ye, Bultena Spî ku bala xwe li ser levkirin û çareseriyê ye yan jî Bultena Aşitî/Çareseriyê, bêne çêkirin.

**10.** Medya divê çalakane rol bigêre ji ber ku di bêçekdarkirina zimên û avakirina raya giştî de roleke sereke digêre.

**11.** Zanko divê di avakirina levkirin û çareseriyê de çalakane rol bigêrin.

**12.** Li hemû zankoyan dersên bi mijara Aşitî û Levkirina Civakî dikarin bêne vekirin.

**13.** Li hemû zankoyan, bi dirêjahiya pêvajoyê û hemaheng li gel teqwîmeke diyarkirî her tim û rêk û pêk dikare konferansên aşitiyê bêne lidarxistin.

**14.** Di bin banê du zankoyan de, yek li Amedê (Zankoya Dîcleyê) yan jî li Mêrdînê (Zankoya Artûklû) ya din jî li Enqere yan jî li Stenbolê, divê du heb navendên Navenda Erşîva Pêvajoya Levkirin û Çareseriyê bêne pêkanîn. Ev navend dê tevkariyeke girîng pêşkêşî Pêvajoya Çareseriyê bikin ku hem ji bo raborî û hem jî ji bo pêvajoyên bê, fonksiyonên wekî belgekirin û erşîvkirin û agahdarkirina raya giştî dê bi cih bînin.

**15.** Ji wan akademîsyenan ku li ser çareseriya pevçûnan û kêşeya kurd dixebitin, divê Desteya Şêwirmendiyê bo Levkirin û Çareseriyê, bê pêkanîn.

**16.** Divê beşdarkirina ciwanan li Pêvajoya Levkirin û Çareseriyê bê pêkanîn. Li ser vê peywendê, li hemû lîseyan divê dersên aşitî û levkirina civakî bêne xwendin. Her wiha li bajaran, her wekî Konseyên Levkirin û Çareseriyê divê Konseyên Ciwanan bo Levkirin û Çareseriyê, bêne avakirin. Bi rêya van konseyan, li hemû bajaran daxwaz û bendewarî û pêşniyarên ciwanan divê li ser maseya çareseriyê cih bigirin.

**17.** Ew rûdanên ku li Sûriyê û Iraqê pêş hatin, wê yekê ferz dikin ku çareseriya kêşeya kurd ya li Tirkiyeyê, divê di nav hevkêşeya herêmî de bê bicihkirin. Tirkiye divê wê şepola kurdan ku di asta herêmî de bilind dibe ne wekî hereşe, bîlekis, divê wek derfetekê bibîne ji bo çareserkirina newekheviyên dîrokî û pêkvejiyansaziyê. Kurd ku beşeke gelek girîng pêk tînin ji gelhe û erdnîgariya Tirkiyeyê, divê destkeftên wan yên di asta herêmî de wek destkeftên Tirkiyeyê bêne dîtin; li ser vê peywendê, divê hem lêgerîna çareseriyeke siyasî ji bo kêşeya kurd ya li Tirkiyeyê û hem jî danîna peywendiyên aşitiyane û dostane li gel kurdên Iraq û Sûriyeyê divê pevre bimeşin.

**18.** Wek dawî, ji ber ku destpêka pêvajoya Osloyê vedigere sala 2008'an, demeke têrî xwe bes, di ser wê qonaxa diyalogê re derbas bûye ku alî berî guftûgoyan pêk tînin ji bo ku hev kifş bikin. Li rex avakariyeke sazgehî/rêxistinî divê Nexşerêyeke nû yan jî Bernameyeke Çalakiyan bê pêkanîn û ji raya giştî re bê aşkerakirin ji bo ku kontrola raya giştî li ser aliyan zêdetir bibe û asteng bike ku alî ji maseyê rabin. Nexşerêyeke wiha ku xwedî çarçoveyek elastîk e, dê hem ji bo bikaranîna demê bi awayekî karîger û hem rakirina xumamiyê û hem jî asankariyê bike ji bo ku ektor teehudên xwe pêk bînin.

**Pêvek 01**

**Ji Dolmebaxçeyê heta Îro: Çi Qewimî?**

- **28'ê Sibata 2015'an**, Civîna Dolmebaxçeyê [14]
- **28'ê Sibata 2015'an**, Serokwezîr Ahmed Davûtoxlu got ku Pêvajoya Çareseriyê êdî ketiye qonaxeke nû û êdî zimanê çekan dê bi dawî bê û dê derbasî jiyaneke demokratîk bibin. [15]
- **1'ê Adara 2015'an**, Bangewaziya Ocelan ya ji bo destberdan ji çekan, di wê daxuyaniyê de ku ji aliyê Hevserokatiya KCK'ê ve hate kirin, wek hengaveke dîrokî hate wesifandin û hate gotin ku eger hukumet, ya ku dikeve ser milên xwe pêk bîne, ew ê jî berpirsiyariyên xwe bi cih bînin. [16]
- **1'ê Adara 2015'an**, Wezareta Karên Derve ya Amerîkayê diyar kir ku ew bi kêfxweşî pêşwaziyê dikin li bangewaziya Ocelan ya ji bo destberdan ji çekan. [17]
- **11'ê Adara 2015'an**, Serokkomar Erdoxan got ku bangewaziya Ocelan ya ji bo destberdan ji çekan, ji bo tesîskirina îtîmat û aşitî û seqamgîriyê girîng e û hêviya wê yekê kir ku ev soz bi dev nemînin û biçine ber cîbicîkirinê.[18]
- **18'ê Adara 2015'an**, Alîkarê Serokwezîr Yalçin Akdoxan got ku divê guh bi wan angaştan neyê dayîn ku li ser destnîşankirina wan navan e ku dikin di lijneya çavdêr de cih bigirin ku ev lijne ji bo Pêvajoya Çareseriyê ye.[19]
- **20'ê Adara 2015'an**, Serokkomar Erdoxan diyar kir ku wî hay ji Lijneya Çavdêr tune ye û bi erênî li vê pêşhatê nanêre.[20]
- **21'ê Adara 2015'an**, Serokkomar Erdoxan got ku min yeqîn ew e ku dê ev Newroz bibe wesîleya serdemeke nip û nû.[21]
- **21'ê Adara 2015'an**, Ocelan di peyama xwe ya Newrozê de ku li Amedê hate xwendin, PKK vexwende kongreyê ji bo destberdan ji çekan. Civîna Kongreyê bi wê şertê ve girê da ku pêkanîna "Komîsiyona Heqîqet û Rûbirûbûnê" bû ku dikir ji mebûs û Lijneya Çavdêr pêk were.[22]
- **22'yê Adara 2015'an**, Serokkomar Erdoxan diyar kir ku ew civîna Dolmebaxçeyê bi rast nabîne.[23]
- **03'ê Nîsana 2015'an**, Ji aliyê Serokkomar ve Pakêta Ewlekariya Navxweyî hate erêkirin ku wek "Qanûna Peywir û Rayeya Polîsan, Qanûna Teşkîlat û Peywir û Rayeyên Cendirmeyan, Qanûna sebaret bi Guhartinçêkirinê di Hin Qanûnan de" tê zanîn.[24]
- **11'ê Nîsana 2015'an**, Li Giyadîna Agiriyê, di wê pevçûnê de ku di navbera PKK û leşkeran de rû da, 4 leşker birîndar bûn û 5 PKK'yiyan jiyana xwe ji dest da.[25]

---

**14** "Ortak açıklamanın tam metni," *AljazeeraTurk*, 28.02.2015
**15** "Başbakan Davutoğlu: Silahın dili sona erecek", *NTV*, 28.02.2015.
**16** "KCK'dan Öcalan'ın çağrısına evet ama…", *AljazeeraTurk*, 01.03.2015
**17** "ABD'den 'Silah bırak' çağrısına yorum", *Sabah* , 01.03.2015
**18** "Erdoğan: Silah bırakma lafla olmaz", *AljazeeraTurk*, 11.03. 2015.
**19** "Yalçın Akdoğan'dan izleme heyeti açıklaması!" , *A Haber* , 19 .03. 2015.
**20** "Erdoğan'dan İzleme Heyeti açıklaması", *Hürriyet*, 20.03. 2015.
**21** "Erdoğan'dan Newroz Mesajı: Yepyeni Bir Döneme Vesile Olacak", *Bianet.org*, 21.03. 2015.
**22** "İşte Öcalan'ın tarihi Newroz mektubunun Türkçe tam metni", *T24*, 21.03. 2015.
**23** "Erdoğan: Dolmebaxçe toplantısını doğru bulmuyorum", *NTV*, 22.03. 2015.
**24** "İç Güvenlik Paketi onaylandı", *Sabah*, 03.04.2015.
**25** "Ağrı'da gerçekte ne yaşandı?", *BBC*, 13.04. 2015.

- **21'ê Nîsana 2015'an**, AKP'ê di beyannameya xwe ya hilbijartinê de cih da Pêvajoya Çareseriyê û dihate gotin ku pêvajo dê piştî 07'ê Hezîranê jî bê berdewamkirin.[26]
- **02'yê Gulana 2015'an**, Serokkomar Erdoxan got ku heta çekan nenêjin, wan ew maf tune ye ku rexneyê li hukumetê bigirin.[27]
- **17'ê Gulana 2015'an**, Konseya Rêveberiyê ya KCK'ê, AKP ji wan hêrişan wek berpirsiyar zanî ku li dijî nivîsgehên hilbijartinê yên HDP dihatin kirin. Her wiha diyar kir ku di rewşeke wiha de çareseriya kêşeya kurd ne mumkun e.[28]
- **31'ê Gulana 2015'an**, Serokwezîr Davûtoxlu got ku em dê piştî hilbijartinê ji nû ve li muxatabê Pêvajoya Çareseriyê binêrin.[29]
- **05'ê Hezîrana 2015'an**, Di mîtînga HDP'ê ya Amedê de hêrişa bombeyî hate encamdan. [30]
- **07'ê Hezîrana 2015'an**, HDP %13,02 deng wergirt û 80 mebûs bi dest xist di meclîsê de. AKP piştî 13 salan desthilatdariya xwe ya takepartiyî ji dest da û ew piranî ji dest da ji bo ku bikare bi tena serê xwe hukumetê damezirîne.[31]
- **12'ê Hezîrana 2015'an**, KCK got ku îradeya çekberdanê di dest wê de ye. [32]
- **15'ê Hezîrana 2015'an**, Piştî ku Girêspî kete destê YPG'ê, kantonên Kobanî û Cizîrê wek erdnîgarî gihîştin hev. [33]
- **26'ê Hezîrana 2015'an**, Erdoxên daxuyand ku ew "li bakurê Sûriyê bi tu şêweyî dê destûrê nedin avabûna dewletekî".[34]
- **01'yê Tîrmeha 2015'an**, KCK'ê daxuyand ku çêkirina bendav û kalekolan tê wateya têkbirina agirbestê û herwiha got ku ew amraz dê bibin hedef bo hêzên xwe yên gerîla.[35]
- **03'yê Tîrmeha 2015'an**, Piştî destûrnedana hevdîtinê li gel Ocelan, Lijneya Îmraliyê ya HDP'ê got ku ji bo pêvajoyê zengilên têkçûnê lê didin.[36]
- **14'ê Tîrmeha 2015'an**, Endamê Konseya Rêveberiyê ya KCK'ê Mûrat Karayilan got ku Pêvajoya Çareseriyê û agirbest di serdemveguhêzîyê (the transition period)yê de ye û got ku dê li gorî wê hukumetê helwestê wergirin ku dê bê damezirandin.[37]
- **15, Tîrmeha 2015'an**, Hevseroka KCK'ê Besê Hozatê diyar kir ku qonaxa nû, qonaxa şerê gelê şoreşger e. [38]
- **20'ê Tîrmeha 2015'an**, Di encama hêrişa bombeyî de ku li Pirsûsa Rihayê ji aliyê DAIŞ'ê ve hate kirin, 32 ciwanan jiyana xwe ji dest da û zêdetir ji 100 kesî

---

**26** "AKP beyannameye süreci ekledi", *AljazeeraTurk*, 21.04. 2015.
**27** "Erdoğan: Silahı gömmeden eleştiri hakları yok", *AljazeeraTurk*, 2.05.2015.
**28** " KCK: Bu ortamda çözüm mümkün değil", *AljazeeraTurk*, 17.05.2015.
**29** "Sürecin muhatabı 'gözden geçirilecek'", *AljazeeraTurk*, 31.05.2015.
**30** "HDP'nin Diyarbakır mitinginde patlama: Yaralılar var", *Evrensel*, 05.06.2015.
**31** "7 Haziran 2015 Genel Seçim Merkezi", *CNN Türk*, 07.06.2015.
**32** "KCK: Silah bırakma iradesi bize ait", *Milliyet*, 13.06.2015.
**33** "Tel Abyad 'YGP güçlerinin eline geçti'", *BBC Türkçe*, 15.06.2015.
**34** "Erdoğan: Suriye'nin kuzeyinde bir devlet kurulmasına asla müsaade etmeyeceğiz", *Mynet Haber*, 27.06.2015.
**35** "KCK'dan Türkiye'ye küstah tehdit!", *Gazete Vatan*, 11 .07. 2015.
**36** "HDP: Alarm zilleri çalıyor", *Aljazeera*, 03.07.2015.
**37** "KCK: Çekilmekle saflık ettik, ateşkes de çözüm süreci de ara dönemde", *T24*, 14 .07. 2015.
**38** Hozat, Besê, "Yeni süreç, devrimci halk savaşı sürecidir", *Özgür Gündem*, 15.07.2015.

birîndar çêbûn.[39]

- **22'yê Tîrmeha 2015'an**, Li Serêkaniya Rihayê, 2 polîs, di mala xwe de bi debancayê hatin kuştin.[40]
- **24'ê Tîrmeha 2015'an**, Tirkiye û DYA gihîştin wê peymanê ku ji bo operasiyonên hewayî rê li ber bikaranîna Baregeha Încîrlîkê vedikir li dijî DAIŞ'ê. [41]
- **24'ê Tîrmeha 2015'an**, Balafirên F-16'î yên Hêzên Hewayî yên Tirkan, wargehên PKK'ê yên wekî Zap, Gare, Heftenîn, Mêtîna û Avaşîn li başûrê Kurdistanê bombebaran kir. [42]
- **12'ê Tebaxa 2015'an**, Erdoxên got ku "Heta ku bêtonê bi ser çekan de ronekin û heta ku terorîstek bimîne, em ê berdewam bin li ser têkoşînê."[43]
- **12'ê Tebaxa 2015'an**, KCK: "Ji bo gelê Kurdistanê, tu bijardeyeke dîtir nemaye ji bilî xwerêveberiyê"[44]
- **16'ê Tebaxa 2015'an**, Yekemîn qedexeya hatûçûyê hate ragihandin li Gimgima Mûşê. [45]
- **17'ê Tebaxa 2015'an**, Hejmara wan navendan bû 16 ku lê xwerêveberî hate ragihandin.[46]
- **17'ê Tebaxa 2015'an**, Hevserokê Konseya Rêveberiyê ya KCK'ê Cemîl Bayik: "Bila DYA navbîniyê bike." [47]
- **19'ê Tebaxa 2015'an**, Li kolanên Cizîra Botan xendeq hatin kolan û berîqet hatin danîn. [48]
- **03'yê Îlona 2015'an**, Rayeya artêşe tirkan hate dirêjkirin ku ji bo operasiyonên derveyî sînoran bû. [49]
- **06'ê Îlona 2015'an**, Di wê hêrişê de ku li Oremarê hate kirin, 16 leşkeran jiyana xwe ji dest da.[50]
- **08'ê Îlona 2015'an**, Di encama hêrişa PKK'ê de li Îdirê 13 polîsan jiyana xwe ji dest da. [51]
- **15'ê Îlona 2015'an**, Li Cizîrê, di wan heşt rojên qedexeya hatûçûyê de, 22 kesan jiyana xwe ji dest da. [52]
- **24'ê Îlona 2015'an**, Rûsiya bi balafirên xwe yên şer ve daxilî şerê li Sûriyê bû. [53]
- **10'ê Cotmeha 2015'an**, Di mîtînga "Aniha Aaşitî li Ddijî Şşer! Mîtînga Ked û Aşitî û Demokrasiyê" de ku bi bangewaziya KESK, DÎSK, TMMOB û TTB li Enqereyê hate lidarxistin, du bombeyên zindî xwe teqandin û di encamê de jî

**39** "Şanlıurfa Suruç'ta intihar saldırısı", *NTV*, 20.07.2015.
**40** "Şanlıurfa'da 2 polis öldürüldü ", *Time Türk* , 22 .07. 2015.
**41** "ABD: Türkiye izin verdi, IŞİD İncirlik'ten vurulacak", *BBC Türkçe*, 24.07.2015.
**42** "Türkiye Kuzey Irak'a operasyon düzenledi!", *CNNTürk* , 24 .07. 2015.
**43** "Cumhurbaşkanı Erdoğan'dan terör açıklaması", *NTV*, 11 .08. 2015.
**44** "KCK: 'Kürdistan halkı için özyönetimden başka bir seçenek kalmamıştır'", *T24*, 12.08.2015.
**45** "Varto'da sokağa çıkma yasağı", *Hürriyet*, 17.08.2015.
**46** "Öz-yönetim ilan edilen merkez sayısı 16'a çıktı", *T24*, 20.08.2015.
**47** "Kandil: ABD ile görüşüyoruz", *AljazeeraTurk*, 17.08.2015.
**48** "Cizre sokaklarında hendekler, mevziler ve tedirginlik", *Radikal*, 19.08.2015.
**49** "Irak ve Suriye tezkeresi kabul edildi", *BBC Türkçe*, 03.09.2015.
**50** "TSK: Dağlıca'da 16 asker şehit", *BBC Türkçe,* 07.09.2015.
**51** "Iğdır'da polis aracına bombalı saldırı! 13 Şehit", *Milliyet*, 08.09.2015.
**52** "STK'lardan Cizre raporu: 22 kişi kayatını kaybetti, yaralıların tedavisi engellendi", *Agos*, 15.09.2015.
**53** "Rus uçakları IŞİD'i bombalıyor", *AljazeeraTurk,* 24.09.2015.

102 kesan jiyana xwe ji dest dan û bi sedan kes jî bûn birîndar.[54]

- **10'ê Cotmeha 2015'an**, KCK ji bo ku hilbijartina 1'ê mijdarê di rewşeke bêpevçûn de derbas bibe, bêçalakiyeke demkî ragihand ku piştî 15'ê Ccotmehê dest pê dikir. [55]
- **01'ê Mijdara 2015'an**, AKP di hilbijartinê de %49,48 deng wergirt û ew piranî bi dest xist ku bi tena serê xwe dikarî hukumetê damezirîne. HDP %10,75 deng wergirt û bi 59 mebûsan çû meclîsê. [56]
- **05'ê Mijdara 2015'an**, KCK biryara xwe ya bêçalakîtiyê bi dawî kir. [57]
- **23'yê Mijdara 2015'an**, Demîrtaş ew teşebusa sûîqestê bire dadgehê ku li dijî wî hatibû kirin. [58]
- **28'ê Mijdara 2015'an**, Serokê Baroya Amedê Tahir Elçî hate kuştin. [59]
- **18'ê Kanûna 2015'an**, Li Amedê hevserokên HDP, HDK, DBP û HDP bi daxuyaniyeke hevpar gotin ku "em bi hemû sazgehên xwe ve xwedî li daxwaza xwerêveberî û têkoşîna gel derdikevin".[60]
- **25'ê Kanûna 2015'an**, HDP angaşt kir ku hukumetê bi Misteşariya Tenzîm û Ewlekariya Giştî "sîmîlasiyona şer" daye amadekirin bi navê "Pîlana Darûxandin"ê. [61]
- **27'ê Kanûna 2015'an**, Piştî civîna awarte ya KCD'ê bi beşdariya HDP, HDK û DBP bi navê "deklarasiyona herêmên xweser û demokratîk" deklarasiyoneke 14 madeyî hate weşandin. [62]
- **30'ê Kanûna 2015'an**, PKK/KCK, li wan navçeyan ku qedexeya hatûçûyê û pevçûn hebûn, teşkîlek bi navê Yekîneyên Parastina Gel (YPS) xiste ber cîbicîkirinê. [63]
- **11'ê Rêbendana 2016'an**, 1128 akademîsiyenan deqek ji raya giştî re ragihand ku tê de rexne li qedexeya hatûçû û operasiyonên hukumetê dihate girtin û her wiha bangewaziyek hebû ji bo vegerîn bo ser maseya guftûgoyê. [64]
- **14'ê Rêbendana 2016'an**, Di wê hêrişê de ku PKK li navçeya Çinara Amedê bi erebeya bomberêjkirî pêk anî, 6 kesan jiyana xwe ji dest da û 43 kes jî bûn birîndar. [65]
- **15'ê Rêbendana 2016'an**, Li dijî wan akademîsiyenên ku daxuyaniya bi sernavê "Em ê nebin şirîkên vî tawanî" îmze kirin; ragirtin, lêgerîna xanî û kargehan, lêpirsînên edlî û îdarî hatin pêkanîn. [66]

---

**54** "Türkiye tarihinin en kanlı terör eylemi: Ankara'daki bombalı saldırıda en az 95 ölü", *diken.com.* tr, 10.10.2015.
**55** "KCK, eylemsizlik kararı aldığını açıkladı", *Evrensel*. 10.10.2015.
**56** "1 Kasım 2015 Genel Seçim Merkezi," *CNN Türk*, 01.11.2015.
**57** "KCK 'eylemsizlik' kararını sonlandırdı", *IMC TV,* 05.11.2015.
**58** "Demirtaş'tan Suikast Girişimine İlişkin Suç Duyurusu", *Bianet*, 23.11.2015.
**59** "Diyarbakır Baro Başkanı Tahir Elçi öldürüldü", *BBC Türkçe*, 28.11.2015.
**60** "HDP, DTK, DBP, HDK: Faşizm rica ile minnetle geriletilmez, direnişi büyütelim", *sendika.org,* 18.12.2015.
**61** "Davutoğlu'na soru: 15 bin Kürt'ün ölümünü öngören 'çöktürme planı' gerçek mi?", sendika.org, 25.12.2015.
**62** "DTK'dan 'öz yönetim' deklarasyonu", *AljazeeraTurk*, 27.12.2015.
**63** "PKK'dan yeni oluşum: YPS", *Milliyet*, 30.12.2015.
**64** "Bu suça ortak olmayacağız! Em ê nebin hevparênvîsucî!", *Barış İçin Akademisyenler*, 11.01.2016.
**65** "Diyarbakır Çınar'da PKK'lılar Emniyet'e bombalı araçla saldırdı", *CNN Türk*, 14.01.2016.
**66** "Barış için Akademisyenler'e gözaltı ve baskınlar", *BBC Türkçe,* 15.01.2016.

- **05'ê Sibata 2016'an**, Serokwezîr Davûtoxlu li Mêrdînê "Bernameya Çalakiyan bo Têkoşîn li gel Terorê" daxuyand. [67]
- **08'ê Sibata 2016'an**, Berdevkê hukumetê Nûman Kûrtûlmûş daxuyand ku wan PYD bi rêyên dîplomatîk asteng kirine ji bo ku beşdarî civînên Cenêvê nebe. [68]
- **14'ê Sibata 2016'an**, Tirkiyeyê li Sûriyê sengerên YPG yên nêzîkî Ezezê û Baregeha Hewayî ya Menagê ku berî demeke kurt ketibû bin kontrola YPG'ê, da ber topan. [69]
- **17'ê Sibata 2015'an**, Di wê hêrişê de ku li Enqereyê li dijî wesayita xizmeta leşkerî hate kirin, 28 kesan jiyana xwe ji dest da. TAK'ê çalakî girte ser xwe; bes hukumetê angaşt kir ku YPG kiriye. [70]
- **21'ê Sibata 2016'an**, Di navbera Tirkiye û DYA'yê de li ser PYD/YPG'ê cudahiyeke kûr rû da. [71]
- **22'ê Sibata 2016'an**, Piştî qeyrana "Bodrim" û "Embûlansê" termên 167 kesan rakirin nexweşxaneyê. [72]
- **26'ê Sibata 2016'an**, Ekrana IMC TV'yê hate reşkirin ku li ser Tirksatê weşan dikir. [73]
- **02'yê Adara 2016'an**, Li Cizîrê, qedexeya hatûçûyê piştî 79 rojan bi awayekî qismî hate rakirin. [74]
- **09'ê Adara 2016'an**, Operasiyonên ku li Sûra Amedê di 28'ê mijdara 2015'an de dest pê kiribûn, piştî 103 rojan bi dawî bûn. Li navçeyê qedexe, ji ber xebatên lêgerîn û lêkolînê, hê jî berdewam dike. [75]
- **11'ê Adara 2016'an**, Piştî ku li Sûr, Cizîr û Hezexê operasiyon bi dawî bûn, wezîrê karên navxweyî Efkan Ala daxuyand ku li Gever û Nisêbîn û Şirnexê jî operasiyon dê bêne lidarxistin. [76]
- **13'ê Adara 2016'an**, Di wê hêrişa bombeyî de ku li Ankara Gûven Parkê rû da, 37 kesan jiyana xwe ji dest da û 125 kes jî bûn birîndar. TAK'ê hêriş girte ser xwe. [77]
- **15'ê Adara 2016'an**, Piştî Sûra Amedê, li taxa Kaynartepe ya navçeya Rezanê, qedexeya hatûçûyê hate ragihandin. [78]

---

**67** "Başbakan 'master planı' açıkladı", *Yeni Şafak,* 05.02.2016.
**68** "Kurtulmuş: PYD'nin Cenevre'ye katılmasını engelledik", *Evrensel*, 08.02.2016.
**69** "Türkiye YPG'yi vurdu", *AljazeeraTurk*, 14.02.2016.
**70** "Ankara'daki saldırıyı TAK üstlendi", *IMC TV*, 19.02.2016.
**71** Tanış, Tolga, "Gerçekler", *Hürriyet*, 21.02.2016.
**72** "137 cenaze bekliyor: Cizîr'de suç aletleri yok ediliyor", *Özgür Gündem,* 22.02.2016.
**73** "Basın özgürlüğünün 'ak günü': Dündar ve Gül yayındayken İMC TV karartıldı", *diken.com.tr*, 26.02.2016.
**74** "79 günlük sokağa çıkma yasağının ardından ilçeye dönen Cizreliler, şimdi ne yapacak?", *T24*, 03.03.2016.
**75** "Sur'da operasyon sona erdi", *Radikal*, 09.03.2016.
**76** "Ala: Yüksekova, Nusaybin ve Şırnak'ta operasyonlar yapılacak", *IMC TV*, 11.03.2016.
**77** "Ankara'da bombalı araçla saldırı: 37 kişi öldü, 125 kişi yaralandı!", *T24*, 13.03.2016.
**78** Diyarbakır Valiliği, "Bağlar Kaymakanlığı'ndan Duyuru (Sokağa Çıkma Yasağı)", *Diyarbakır Valiliği*, 15.03.2016.